

# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



# ROJA NU

ORGANA KOMELA KARKERÊN KURD LI SWËD  
İSVEÇ - KÜRT İŞÇİ DERNEĞİ YAYIN ORGANI

Hejmar 1  
Çırıya paşin 1978  
Sayı 1  
Kasım 1978

## "KANATLI JANDARMA-78" SÖMÜRGEKİLERİN KÜRT HALK PLANLADIKLARI SAVAS

Türkiye işbirliği tek-tak bir savaşı zisi varatti i hukumetin sözüne reşit halkyi işbirliği yâfere, nüfus

sun nezî muhalefetini  
İşte hâlenek isti  
terine yerlestir  
nâdalarını k  
kac sena  
yâfere  
Ri

### ÇIKARKEN

Kurdistan'da sivilleri işgal etti  
dipli uyuşmaları sügürür. Bu, eylem  
deftarı ama Zât hâlkinin bâsi  
jandarma dîpâji enzîmî qâzî  
halzinin varlığı mala atla  
yor.

Jenesis prevalansı  
ler ile sümürgeciler  
sugorlar. Kürt  
lur edili  
Sömürg  
kun

sun nezî muhalefetini  
İşte hâlenek isti  
terine yerlestir  
nâdalarını k  
kac sena  
yâfere  
Ri

is-  
avam 2.s.

ROJA NÛ 10 salêñ xwe tiji kir



22  
—  
1988

“ÇAL  
TATBİKA

Kara, Hava ve Jandar  
nasyon ve spôrlarını sağla  
“Çalalar - 78” tatbikatı da  
“Görkemli” adı verilen 15  
günde, 15000000 TL'lik  
ritual destegi ile Kapıçam belgesi  
hazırlıtılmış, bu nedenle 15. Kuvvet

## NAVEROK

Welatparêz û ronakbirê hêja NUREDÎN ZAZA mir.....	3
ROJA NÛ û xebata 10 salan.....	4
Xebata Kurdzaniyê gavên mezîn davêje – Prof.Ş. XUDO.....	8
Otoriteya dê û bav – A. MAKERENKO.....	12
Prof. H. Cindi û C. Celil bûn 80 sali.....	14
Çend Çarin – BARAN.....	15
Jî Diroka Kurdistanê (Jî Gernama E.ÇELEBÎ).....	16
Kolonyalist barbariyên hev dîmîxê min.....	19
Grêva Birçibûnê .....	22
Jî Nav Edebiyata Cihanê : E. HEMİNGWEY.....	24
Gotnên Pêşîyan.....	26
Helbest.....	27
Piyes: Kincê Sporê Yêr Sê Reng – VAZGAL.....	28
Quncikê Zarokan: Pîdîx û Pira Mirovxur – SİPAN.....	30

Sal: 10

Hejmar 65, Çileyê Pêşin 1988

XWEDİ : KOMKAR - Swéð  
BERPIRSIYAR : Séroyê BOTAN  
NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08/ 32 82 51  
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN  
ADRESS : Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
TELEFON : 08 / 32 82 51  
PG : 458980 - 0

Welatparêz û Ronakbirê Hêja

# DR. NÜREDİN ZAZA MIR



Nüredin ZAZA, roja 7'ê Çiriya Péşin li Lozanê çû ser heqiya xwe. Zaza 69 sali bû û pêra nexweşîya kansérê hebû. Lî ser daxwaza malbata wi, cenazê wi li goristana Lozanê hat weşartin.

Welatparêz û ronakbirê navdar Dr. Nüredin Zaza di sala 1919 da li qeza Madenê hate dinê. Malbata wi malbatêke welatparêz bû û beşdari Serhildana Şêx Seid bû. Piştî şikestina Serhildana Şêx Seid, Nüredin Zaza (ku hingê şes (6) sali bû) bî kekê xwe Dr. Nafiz ra derbasi Binxetê bû û li navça Cizirê (Kurdistana Sûriyê) ciwar bû.

Nüredin Zaza di xortaniya xwe da, li Sûriyê bî awaki aktiv beşdari tevgera welatparêz bû. Dema li Şamê dixwend, di nav ciwan û xwendekarên Kurd da xebatên siyasi û çandi dikir. Piştgiri dîda tevgera netewi a Kurdistana Iraqê. Di sala 1944'an da xwast xwe bigihine şoreşa Kurdistana Iraqê, li Müslîmî tê girtin û saleki di girtixanê Bexdayê da dîmine. Paşê ji diçe Lubnanê û dest bî xwendina siyasi dike. Lî wir bî malbata Bedîrxanan

ra dide û distine. Dî kovarêن Hawar, Ronahi û Roja Nû da dînivise û keda xwe dike nav van eseran.

Piştî xwendina xwe ya Beyrûdê diçe Swisrê û li wir doktora xwe ya li ser pedagojiyê çêdike.

Nüredin Zaza li Ewrûpayê ji gelek xebatên kérhati dike. Jî bo cara yekemin Komela Xwendekarên Kurd li Ewrûpayê, bî péşengiya wê tê avakîrin. Wi li ser rewşa gelê Kurd û Kurdistanê seminar didan, bî rojnamevanan ra dîda û distend. Ü hingê wi bî çend hevalên xwe ra tevayı, bî zimanê Kurdi û Fransızı kovara "Dengê Kurdistan" 12 hejmar derxist.

Dî sala 1957'an da vege riya Sûriyê, bî hin welatparêzén din ra, bî dîzi PDK-S avakîr. Jî ber xebatên xwe gelek caran hat girtin. Lî wi dest ji parastîna mafêñ gelê Kurd bernenâ. Bî wextê ra, li Kurdistanâ Sûriyê bû serokeki siyasi ê berbiçav.

Dî sala 1967'an da polêsê Sûriyê wi neçar dikin ku ji Sûriyê derkeve. Bî dîzi vedigere Kurdistanâ Tîrkiyê. Lî

MİT pê dihese, ew xwe demekê li Istenbolê vedîşere, xwe nade dest. Hukumeta Tîrkiyê wi ji hewwelatiya Tîrkiyê davêje. Lema bêçare dîmine û disa vedigere Swisrê.

Dî sala 1970 da li Swisrê wek penaberekî siyasi tê qebulkirin. Lî wir bî rojnamevanake Swisri ra dîzewice. Kureki wi heye, bî navê Şengo, 15 sali.

Nüredin Zaza li Swisrê ma mostayê zumanê Kurdi bû. Wi alikariya karker û penaberên Kurd dikir. Jî bo danasina gelê Kurd li Ewrûpayê gelek xebatên hêja kîr. Dî sala 1982'an da bî navê "Jiyana min a Kurdi" bî Fransızı, pirtûkek nivisi. Wi gelek ziman dizanibûn: Kurdi (zaravê Kurmançi, Sorani, Zazaki), Ermeniki, Tîrki, Erebi, Farisi, Fransızı, İnglizi...

Dr. Nüredin Zaza jîna xwe pêşkêşi xebata azadiya gelê xwe kîr. Ew niştimanperwereki ronakbir, têkoşer û dîlsoti bû. Gelê Kurd wê xebat û kîrinêن Nüredin ZAZA hertim bî bir bine.

# ROJA NÛ

## û xebata 10 salan

Roja Nû isal deh salên xwe tiji kîr. Hejmara wê ya pêşin di sala 1978'an meha 11'an da derket. Bî vê hejmara di destê we da ew gihişte 65 hejmaran. Organa Komela Karkerêñ Kurdistan, Roja Nû, bî van deh salên weşanê, bû yek jî wan rojname û kovarêñ Kurdi yên heri jiyan-dîrêj. Û hî dervayı welat (Ewrûpa) ji ya heri jiyan-dîrêj Roja Nû ye.

Bêşik jî bo weşaneke peryodik xusûsiyeten giring ne te-nê ew e ku çend salan û çend hejmaran derketiye. Lê wek ku xwendevanê me ji baş pê dîzanîm, û ne hewce ye ku em dûr û dîrêj behs bikin; di rojnamevaniya Kurdi da 10 sal û 65 hejmar, jî bo weşaneke peryodik hêjayi pirozbahi û serbilindiyê ye. Dema mîrov rewşa rojname û kovarêñ Kurdi bî yên milletên azad ra rûbari hevdu bike, dîbe ku ev serfirazi geleki bîçûk û kêm bête ditin. Lê gelê me ne azad e. Welatê me koloni ye dî bin lepêñ çar dewletan da. Gelê Kurd jî hemû mafêñ netewi û demokratik bêpar e. Dijmînê gelê me, hêzên kolonyalist bereki va welatê me talan dikin û bereki va ji bî zîlm û barbarîyeke nediti êrişî gelê me dikin. Ew dikin ku navê Kurd û Kurdistanê ji rûyê dinê hilinin. Jî bo vê ji hemû awayêñ zordestiyê, qetliaman û çerxa asimilasyonê (helandinê) bî hevra dîmeşinîn. Di nav planêñ tunekirina gelê me da, qedexekirin û inkarkirina ziman, çand û diroka gelê Kurd, jî bo kolonyalistan pirseke sereke ye. Bî taybeti politika dewleta Tîrk di vi wari da geleki eşkere ye.

Ew jî weşanêñ pêşverû û şoreşger, jî derketinâ rojname, kovar û kîtêbêñ Kurdi geleki ditîrsin. Jî ber ku ew rastiyê tinin meydânê. Propaganda û derewên kolonyalistan pûç dikin, li diji zordestiyê û kedixwariyê gel hisîyar û bî rêz dikin; hebûna çand, ziman û tarixa gelê Kurd li ber çavan rádxin...

Bî vê bir û baweriyê, Roja Nû, deh salan û bê rawestan derket. Em bawer dikin, hîndik be ji wê xizmeteke baş pêşkêşî ziman û çanda gelê me kîr.

### KOVARA HUNERI, ÇANDI Ú EDEBI

Çawa tê zanîn, Organa Komela Karkerêñ Kurdistan Roja Nû, heta sala 1983'an (43 hejmar) bî zimanê Kurdi û Tîrki, jî mehê careki derdiket. Jî hejmara 44'an pêde wek kovar û tenê bî zimanê Kurdi derket û derdikeve.

Roja Nû hin di destpêkê da li çarali Kurdistanê û li gelek welatêñ Ewrûpayê û ên din gihişte destê xwendevanan û hat hezkirin. Wê di gel xwendevanan dan û standîneke germ saz kîr. Jî xwendevanan piştgiriyeke hêja wergirt. Wan bî nûçe, helbest, serpêhati, çirok û nîvisêñ xwe rûpelîn wê xemîlandin. Niviskar, zana û mamostayêñ wek Cigerxwin, Qanatê Kurdo û gelekîn mayin bî name, bend, lê-kolin û helbestêñ xwe piştgiriyeke mezîn dane Roja Nû.



## BI KURTÎ ÇEND XUSÜSİYETÊN ROJA NÛ

● Roja Nû bî zanin û berpirsiyari li diji propaganda hêzên kolonyalist û nijadperest ku hebûna gelê Kurd, çand, ziman û tarixa wi inkar dîkin, nizim dîbinin û wîsa nişan dîdin, bî xurtî derketiye.

● Roja Nû jî bo niviskar û helbestvanê nûgîhiştî bûye plafonmeke baş ku ew efrandinê xwe pêşkêşî xwendevanan bîkin.

● Roja Nû jî bo danasina ziman, çand û edebiyata Kurdi bûye çavkaniyeke hinbûn û zanine. Derbari edebiyata Kurdi ya nû û kevn da; li ser kesen zimanzan, edebiyatnas, dirokzan û kurdologên berê û yên nuha, hunermendên Kurd û efrandinê wan, gelek bend, hevpeyvin û lêkolinê berjewendi hatine weşandin.

● Roja Nû her tim cih daye deng û behsêñ giring ên welat. Jî têkoşina azadiya gel û welatê me ra piştgiriya xwe nişandaye. Bî ditinê welatperwer û şoreşger, li diji kolonializmê, emperializmê û paşverûtiyê dengê xwe bilind kiriye.

● Roja Nû cih daye xebat û çalakiyên Komelê û deng û behsêñ li Swêd.

● Jî çarali dinê, bûyerên çandi yên kurdi wek deng û bahs hatine belavkirin.

● Jî Edebiyata Cihanê ji nîmûneyên bijarte hatine pêşkêşkîrm. Roja Nû gelek nivisên hêja jî zimanên biyani wergerandine Kurdi.

● Jî bo danasina weşanêñ nûderketi, di Roja Nû da rûpeleki taybeti cih girtiye.

● Roja Nû cih daye quncikeki zarokan ji. Bî zimaneki sıvik gelek çirok, têderxistinok û xaçepirs hatine weşandin.

● Roja Nû jî bo pêşketina zimanê Kurdi yê nîvisandînê roleke berbiçav leyist. Wê zimaneki hêsan û zelal bî kar anîye, jî zimanê axaftinê dûr neketiye. Ev rasti jî aliyê xwendevanan ji her tim hatiye diyarkirin û gotin.

● Roja Nû bî vê jiyana xwe ya dehsalan bû nîmûneyeke baş jî bo xebata tevayı (kollektif) û rêxistini.

● "Weşanêñ Roja Nû" jî sala 1980 heta nuha 27 pirtük (ku jî vana 25 bî zamanê Kurdi ne) pêşkêşî literatura Kurdi kiriye. Û disa dî vi wari da (çapkırın û belavkirina berhemên Kurdi) wek weşanxane Roja Nû cihê pêşin girtiye.

Dî gel van tiştan pêwist e em bîbêjîn: xebat û pêşketina Roja Nû ne li gor dilê me ye û haya me jê heye ku kêmasiyên wê hene. Em hewl dîdin ku kovareke hin çêtir û bî awaki tekûztır, bî naverokeke zengintir derxin. Lî bêşik, ev tenê bî me va jî girêdayi nine. Ev her wîsa bî xwedilêderketin û piştgiriya xwendevanan va jî girêdayi ye. Em hêvidar in ku xwendevan, niviskar, hunermend û herkeseki welatparêz bî nivis, pêşniyar, rexne û nûçeyên xwe kovara xwe bîkin baxçeyeki zengin ê ziman û çanda gelê me.


Dî salgeriya 10'an a-derketîna Roja Nû da, em serfirazi û dîlşahiyê bî hemû wan kesan ra parve dîkin ku heta nuha çi dî amadekirin, belavkirina Roja Nû da xebitine çi jî bî nivis û berhemên xwe besdari vê xebata tevayı bûne.



CIGERXWIN



FOLKLORA  
KURDİ



## weşanêن ROJA NÛ

ereb şemo

DIMDIM  
roman

STOCKHOLM 1983

PROF. QANATÊ KURDO

TARİXA  
EDEBYETA  
KURDİ

2

Bo ku bigijine vi merem û mebesti, miletê Kurd niha dest bî rewşenbirkirinê kîriye. Dî pîrsa rewşenbirkirinê da, dî pîrsa xwendewariyê da, pîrsa heri bî qimet, hêja û nîrx ew pîrs e, ku miletê Kurd pê hesiyaye, baş dizane ku ew mileteki serbixwe ye, ku zimanê Kurdi zimaneki xwerû ye, ku tarixa Kurda medeniyet û şaristaniya wan xwerû ne.. Qanatê KURDO

Serê çandiyê ji parçek ji şerê azadiyê ye. Dijminêk mezin ji nezani ye. Heke dijmin fîrsend ne daye dibistanên me hebin, dwê em wan bî xwe çêkin. Mervî ku bixwaze dikare di zîndanan da ji hinbe. Beri hertiştî dîlkîrin e, cehd e, qiret e.

(...)

BARAN

BARAN

DERSÊN  
ZMANÊ  
KURDİ



Faqî Teyran  
ŞEX SEN'AN



Gundi

LI SER  
RÊYA  
CEGERXÜN

edîbiyî dîlîkî

Seydayê Keleş



EM  
O  
DIJMIN

ROJA NÜ

TOSINÊ REŞIT  
SİYABEND  
Û  
XECÊ

(drama ji du pékhâtuşa)





## W E S A N È N   R O J A   N Ü

- 1- RONAK, Diwana 4'a, Cigerxwin, Stockholm 1980
- 2- ZEND-AVISTA, Diwana 5'a, Cigerxwin, Stockholm 1981
- 3- KILAM Ú MIQAMÊD CIMETA KURDA, Cemila Celil, Stockholm 1982
- 4- ŞEFEQ, Diwana 6'a, Cigerxwin, Stockholm 1982
- 5- ZOZAN, Casimê Celil, Stockholm 1982
- 6- HÈVÎ, Diwana 7'a, Cigerxwin, Stockholm 1983
- 7- DIMDIM, Ereb Şemo, Stockholm 1983
- 8- TARİXA EDEBYETA KURDİ/ 1, Qanatê Kurdo, Stockholm 1983
- 9- ALIKO Ú BAZ, Baran, Stockholm 1985
- 10- TARİXA KURDISTAN / 1, Cigerxwin, Stockholm 1985
- 11- KÜRDİSTAN'DA EĞİTİM SÜREÇLERİ, Rohat, Stockholm 1985
- 12- TARİXA EDEBYETA KURDİ/ 2, Qanatê Kurdo, Stockholm 1986
- 13- LI SER RÊYA CEGERXÜN, Gundi, Stockholm 1986
- 14- ŞÊX SEN'AN, Feqê Teyran, Stockholm 1986
- 15- EM Ú DIJMIN, Seydayê Keleş, Stockholm 1986
- 16- DAXWAZNAME, Nami, Stockholm 1986
- 17- HATIRATIM, Vet. Dr. Nuri Dersimi, Stockholm 1986
- 18- NÜBAR, Ehmedê Xani, Stockholm 1986
- 19- MEWLÛD, Mela Ehmedê Batê, Stockholm 1987
- 20- DİWAN, Melayê Ciziri, Stockholm 1987
- 21- TARİXA KURDISTAN/ 2, Cigerxwin, Stockholm 1987
- 22- AZADÎ Ú JİYAN, Kemal Burkay, Stockholm 1988
- 23- ŞERVANEKİ BIÇÜK Ê VIETNAMÎ, Nguyen Than, Stockholm 1988
- 24- DERSÎN ZIMANÊ KURDİ, Baran, Stockholm 1988
- 25- FOLKLORA KURDİ, Cigerxwin, Stockholm 1988
- 26- SİYABEND Ú XECÊ (dram-piyes), Tosinê Reşit, Stockholm 1988



Serokê para Kurdzaniyê ya İnstituta Akademiya Ermenistanê  
ya ilmên Rohilatzaniyê, prof. Şekroyê XUDO:

# XEBATA KURDZANIYÊ GAVÊN MEZIN DAVÊJE

**C**awa Cigerxwinê mezin dibêje û dengbêjê  
me yê mezin ji rind distirê, dibêje: Kine em?  
Ez bersiva vê pirsê bidim.

Xeberdana min a iroyin wê li dora vê pirsê  
here û bê. Bersiva vê pirsê ji aliyê Kurdzaniyê  
(Kurdoloji) va tê dayin. Kurdzani ew ilm e yê  
ku derheqa Kurdan û Kurdistanê da bî tomeri  
lêkolinan çêdike. Lî vir dikeve diroka Kurdan,  
edebiyat û medeniyeta Kurdan, ziman, erf-  
edetêñ wan, rabûn rûniştandina wan, nivisêñ  
wan ên diroki û hezar pirsêñ mayin.

Ez dixwazim axaftina xwe bikim sê beşan:  
Li Ermenistanê, Yerevanê çi hatiye kîrin bona  
rêçgeriya wan pirsêñ ku bî dirok, edebiyat û  
kultura me ra girêdayi ne; iro çi tê kîrin, me  
çi kiriye. Û ya sisîyan, çi bîryarêñ me hene  
weki em ji vir şûnda bikin. U bi vê yekê ra gir-  
êdayi —pirseke geleki ferz e, bî texmina  
min— kijan problemêñ giring û ferz li pêşîya  
kurzan û kurdnasan sekiniye?

## AKADEMÎYA ERMENİSTANÊ YA ROHILATZANIYÊ Û BEŞÊ KURDZANIYÊ

Heft beşen Rohilatzaniyê hene ku van tiş-  
tên han wek babet digre nav xwe: Tirkîye,  
Iran, welatên Ereban, Rohilata Kevn, Qavkaz-  
ya, paşê beşek heye jê ra dibêjin beşê serekaniyêñ  
Rohilate bî zimanê Eredi, Farisi, Tirkî,  
Ermeni. Ya heftan ji beşê Kurdi ye.

Extiyari û mecalêñ me weke hev in. Vê ga-  
vê deh (10) kes di beşê Kurdzaniyê da dixebeitin.  
Dudu ji wana profesor in, heyşt doktor in.  
Fırqin û cûdabûna beşê Kurdi li İnstituta Ye-  
revanê ya Rohilatzaniyê ji yêñ mayin ew e  
weki li İnstituta me temamiya problemêñ  
Kurdzaniyê têñ lênihêrandin. Mesela li Lenin-  
gradê karêñ pîrin bî pirsêñ zîmin û folklorê va  
mijûl dîbin. Lî Moskovayê bî pirsêñ diroka  
Kurda ya vi wexti va mijûl dîbin. Lê li İnstituta  
me bî temamiya problemêñ Kurdzaniyê va  
mijûl dîbin. Diroka Kurda ya nuha û kevn, et-  
nografsa, angó ilmê derheqa erf-edetêñ Kur-  
dan da, zimanzani, folklor (zargotin) û pirsêñ  
mayin.



Ev koma me, pêşiyê jê ra digotin Koma  
Kurdzaniyê, di sala 1958'an da hatiye sazkin-  
rin, wexta cara pêşin bingeha rohilatzaniyê li  
Ermenistanê hate danin. Wê demê kêm meriw  
li vira dixebeitin. Di sala 1971'an da ev kom bû  
beşa Kurdzaniyê. Wê di van salêñ derbasbûyi  
da ji çil û pênc (45) pirtûkan zêdetir çap kiri-  
ye.

Çapkirina pirtûkan li Yekitiya Sovyet, ji ya  
welatên mayin cudatir e. Lî ba me çapkirina  
kitêba ne ewqas hêsan e. Ne ji ber gengaziyêñ  
çapkirinê, lê ji ber ku heta çapkirina xwe, pîr-  
tûk gereke bê anenekirin, lê bê nihêrandin; di-  
vê hemû pêşekzanêd wê pirsê va girêdayi lê  
bînihêrin, bîryar bidin; ew pîrîtûk hêjayi çap-  
kirinê ye, yan na.

Xên ji van pirtûkan, bî sedan miqalêñ ilmi  
hene ku derbari pirsêñ Kurdzaniyê yêñ cu-  
cada da hatine nivisandin.

## DI NAVBERA İNSTİTUTÊN KURDZANIYÊ DA KOORDİNASYON Û XEBATÊN SER DİROKA KURD Û KURDISTANÊ

Xebata instituta me di hundirê xwe da ne  
izolekuri ye. Gelek pîrs hene weki em û İnsti-  
tuta Moskovayê ya Rohilatzaniyê (ku serokê  
wê M.Hasretyan e. Bi eslê xwe Ermeni ye, me-  
riveki geleki şîrhalal e, bo gelê me kareki baş  
dike) bî hevra li ser dixebeitin. Anglo di navbera  
xebatêñ Kurdolojiyê da koordinasyon heye.  
Yek ji me haj xebata yê din heye. Em dizanin  
ew çi dikin, ew dizanin em çidikin.

Gelek xebat hene em tevayı dikin. Mesela  
xebateke me ya tevayı û lap berbiçav "DİRO-  
KA TEVGERA KURDA Ya Sedsala 19'a û  
20'i"

Ev pîrîtûka pêşin ya akademik û ilmi, ne te-  
nê li Yekitiya Sovyet lê her wîsa ji li temamiya  
dînyayê da bî ilmi, herali va lê hatiye lêni-

hêrandin. Doza Kurdi bî giştî, ya her çar parçen Kurdistanê...

Nuha em û Beşê Kurdi li Înstituta Moskovayê tevayı xebateke mayin hazır dikan. Navê wê weha ye: "KURD". Ev xebateke ansiklopedik e, heta iro tişteki wisa, li tu derê nehatîye çapkirin. Geleki kérhati ye. Me xebata wê serheva anije û wê dawiya vê salê bê çapkirin. Dî vê xebatê da divê ev tişt hebin: Hejmarra Kurdan, ax ango temamiya erdê Kurd lê dijin; tebieta Kurdistanê, zimanê Kurdi, zaravê Kurdistan, edebiyata me ya kevn û nû, hunermen-dên Kurd, film, teatr, reqas û muzıqa Kurdi, partiyê Kurdistan yêni siyasi, bî kurti temamiya wan pırsan ci ku bî Kurdan va girêdayi ye. Tu derheq Kurdan da tu ci bixwazi dikari téda bibini.

Nuha li Yerevanê sê (3) xebatén mezin, li ber çapê ne. Yek ya Lazarev e —ez bawer dikim ev nav ji we ra nas e—. Navê kitêbê weha ye: "EMPERYALİZM Û DOZA KURDİ YA NETEWİ". Pirtûka duduwa ya M. Hasretyan e: "TEVGERA NETEWİ YA KURDAN LI TIRKİYÊ —Jî sala 1918'a heta iro" Pirtûka sisîya ya min e, li ser Diroka Tevgera Kurdi li Iraqê. Navê pirtükê weha ye: "DOZA KURDİ YA NETEWİ LI IRAQÊ —Dî roja iro da"

Bî kurti me ewqas xebat kiriye û ewqas tê kirin. Ez ji bir nekîm ji we ra bêjîm, dî gel van xebatan, ci li Yekitiya Sovyet ci ji ji sinorêni Sovyetê der, geleksin Röhîlatzaniyê cu-da-cuda pêktên û dî wanda gelek caran dirok-zanêni Kurd, zimanjan û folkloristêni Kurd besdar dibin.

Nuha ez dixwazîm derbasi para qisa xwe ya duduwa bîbim.

Dîwê bêjîm ku diroka Kurdan û Kurdistanê, ya sedsalêni 19 û 20'an, pir hindik, pak yan xirab hatîye lênihêrandin. Diroka Kurd û Kurdistanê ya sedsalêni navin û bî taybeti yêni ji wê ji kevintir pir xirab hatîye nivisandin. Vê demê, him xebatén hatîne nivisandin kêm in, him ji ewêne hatîne nivisandin bî aliyê ilmi va li ser dereceke ne ewqas bilind in.

Gelek pirs hene ku bersiva wan hela hê bî giştî tune. Em hildin pîrsa dewleta Kurdan. Heta iro ji tê nivisandin ku dewleta Kurdan tunebûye. Wextê neyarêni me dibêjin ew tişteki din e. Lé wexta em xwe bî xwe bibêjin, ev bedbextiya me, nezaniya me dide xuyan. Dewleta Kurd ya yekbûyi tunebûye. Lé dewletêni Kurda hebûne. Dîwê em vê rastiyê binin ber çavan ku gelén dînyayê me nas bikin.

Mixabin ku em Kurd bî xwe ji wisa dizanin ku em Kurd hema eşiri bûne, me pez çêrândiye, dewar xweyi kiriye, ajotkiye ser filan qebîlê, xwe xwe hevdu qirkiriye. Wisa nine geli hevalan. Kurd bî xwe tarixa xwe xirab dizanin. Û ev ne gunehkariya me ye, ev trajediya me

ye. Ev problemeke giring e li pê şiya me gişkan sekiniye.

Mesela em bigrin dewleta Merwaniyan. Di sedsala 10'a û 11'a da. Kurdan ne tenê dî nav pêwendiyêni Ereba, Farisa û Bizansiyê da roleke mezin dilizt, lê wisa ji dî nav xwe da, li vê dewletê gelek tişt kirine. Ilm lê hatîye nihêrandin. Xebatén avayı û çêkirinê yêni wisa hatîne kırın ku meriv zendegirti dimine. Kela çêkirine, qesir çêkirine, pire çêkirine. Ev baş na-yêni zanin.

### PEYDAKIRIN Û ÇAPKIRINA SEREKANIYAN

Pirseke mayin ya peydakirin û çapkirina wan serekaniyan e yêni ku dikarin mecalê bidîne me, destûrê bidîne me, rê ji me ra vekin ku em diroka xwe ya qurnêni (sedsal) navin binivisin.

Kijan in ew serekaniyana? Di seri da serekaniyêni bi zimanê Farisi, paşê yêni Erebi têni û paşê yêni Ermeni têni. Pareke wan ji yêni Tirkine.

Me ev problema baş fehm kiriye. Em dixe-bitin, hewl didin ku 5 - 10 salêni din ew gişk dî bin destê me da hebin ku em bî awaki ilmi, wek vê pirtûka ku vê axîriyê hatîye çapkirin, em diroka Kurd û Kurdistanê ya sedsalêni navin binivisin.

### NUHA CI TÊ KIRIN Û EM DIXWAZIN CI BIKIN

Li Înstituta me xebatkareki me heye li ser serekaniyêni Erebi dixebe, bo Kurd û Kurdistanê. Ew bî eslê xwe Ermeni ye. Ji Sûriyê ve-geriyaye, Kurdi mina min û we dizane. Xebata wi hatîne çapkirin. Min çend nimûne bî xwe ra anije vira. Navê pirtûka wi weha ye: "SEREKANIYÊN EREBÎ DERBARÎ KURDAN DA —Sedsalêni 7 - 10". Di nav vê pirtükê da gelek pîrsen heweskar hene. Ji bo min ji geleki intressant e weki bizanibim gelo Kurd û Kurdistan dî ci hali da bû di sedsala 7'a da ku hingê dinê Mihemedi pêşda hat û dest pê kir di nav Kurdan da belav bû.

Vê gavê pirtûkeke din ji hazir e, wê züttre-kê bê çapkirin. Tarixa Meyafarqin, derheqa dewleta Merwaniyan da.

Înstituya me wek armanc daye ber xwe ku 10 - 15 salan li ser serekaniyêni dirokê bixebe. Ci ku di destê me da heye, ci ku li Ermenistanê, li Muzeya Britanya hene, li ciyêni mayin hene. Bi mikrofilm, bi riyêni cuda-cuda binin çap bikin weki dînyayê bî xwe bîhesinin.

Di vi wari da bî zimanê Farisi li Leningradê xebateke baş tê kirin. Li wir, Vasilievayê Şe-

refxan Bitlisi tercumeyi Rûsi kiriye. Nuha ji ew li ser serekaniyên Farisi ên mayin dixebite. Mesela di saya wê da em Kurdên Sovyetê pê hisiyan (nizam hûn haj pê hene?) weki di qur'a 19'a da, li temamiya Rohilata Nêzik ú Navin, şair û dirokzaneke meşhûr û jin mina Mestûre (Max Şeref xanum Kurdistani) tunebûye. Mestûre ji malbata Erdelanen bûye. Wê bi hostatike mezin helbest nivisine û bi merifeteke mezin diroka Emirata Erdelanen nivisiye.

Nuha li Înstituta me problemek heye, ku tenê em dikarin çareser bikin. Yan gerek em bikin, yan ji kes nikare bike. Mebest, serekaniyên Ermeni yén sedsalên navin 7, 8, 9'an û heta 15'a ne, ku di wan da li ser Kurd û Kurdistanê agahdari hene. Çetinahi ew e ku ev serekaniyên han bi Ermeniya kevn hatine nivisandin. Ermeniya ku em iro qise dikin û Ermeniya kevn ne mina hev in. Dîwê merîv zimanê Ermeni pir baş bizanibe ku ji wan fehm bike. Nuha em dixwazin yeki bibinin ku li ser vi kari rûnê û zemaneki dûr û dirêj bixebite.

Gereke ez ji we hevalên granbiha ra bêjim, ji gelên kevn, yén ku ciranê Kurdish û Kurdistanê bûne, tukesi derheq Kurdish û Kurdistanê da, qasi Ermeniyân pir neniysiye. Û dîwê ez bêjim weki di gelek serekaniyan da tiştên fehş (şaş, xelet) kirine. Ew li herderê dibe, lê bi gişti û piraniya xwe va ewana geleki objektiv in. Çima? Çimki ew gelên din hatine û çûne, lê Ermeni û Kurd timi di nav hev da jine. Bêşik ne mina hev e, dema yeki şareza ji welateki dûr té û tenê hefteki dimine di nav vi gelida, lê tişteki cuda ye ku ciranê bav û kalan bi û hertişt bi te ra eyan e. Ji ber hindê qimeta serekaniyên Ermeni geleki bîlind e.

Ez dixwazim gotuna xwe ya li ser diroka Kurdish bi van çend gotinan xilaz bikim: Hela hê ji me ra li hev nehatiye ku em diroka tevgera Kurdi binivisin, bi taybeti ji aliyê teşkilata û rêxistinêne wê va.

Min careki bi laqirdi got ku hîzbêñ me şikir pir in. Ez di nava vê piraniyê da tenê bedbextiyê nabinim. Çimki ew gelê ku wexteki, bi temamiya xwe va di bin hukmê axa, bega û şêxa da bû, kijan alida dibirin, eger ji kara wi ra ji nin bûyâ ji, li pey diçû. İro ew gel bi parti hatiye meydana siyasi. Anglo dibêje, bi nivis û program ez vê pirsê weha datinim, weha dixwazim yan naxwazim. Eva pêşdaçûyin e li gor ditina min. Ya dudya eva nişana zêdebûna aktivitiya gelê Kurd e.

Di hêla din da, tunebûna yekitiyê û dutirti şuxulê me xerab dike. Lê min bir û baweri heye, ez bi guman im weki yekbûna tevgera Kurdi wê pêk bê. Çimki iro berpirsiyarê hemû partîyan li ser pêwisti, lazimayi û kérhatiya yekbûna hereketa Kurdi hemfîkir in. Ez wek şexis, di pîrsa Kurdish da geleki optimist im.

Ez bawer dikim gelê Kurd wê bigihije arman-cen xwe.

Pirsek din, ideolojiya teugera Kurdish e. Bo vê pirsê cara pêşin du miqale min çapkirine. Anglo bi ci ideolojîyê pêşengi tê kîrin, di tevgera Kurda ya iroyin da. Em ci dixwazin, kapitalizmê dixwazin, sosyalizmê dixwazin, tişteki sisiyan dixwazin...

## Folklor

Geli hevala, ez geleki hêvidar im weki em di nava gîrdava problemen mayin da ji bir nekin ku, folklor xîzneyeke geleki mezin e. Bona sıfetê me yê milletiyê, bona tarixa me, bona xeysiyeta me, bona zimanê me, bona hemû tiştî... Lema ji folklor di nav xebata me da ci-yeki geleki mezin digre û ji vir şûnda ji emê geleki gudari bidine ser.

Teknikê, TV û radyoyê nuha folklor (zargotin) li quncikeki asê kiriye. Gişk winda bûne, winda dibin. Ew hoy (şert) nemane ku em mina berê, li odan, li cimaetan berevbin û bîbîzin çîka merîwêñ zana ci dibêjin. Ew ji me ra mina zaninehêki hesab dibû. Ew mecalen ku zargotin xwedi dikîrin iro êdi nemane. Ew merîwêñ zane, ew ji êdi winda dibin.

Lema bi texmina min, wê di cih da be, em rast e ne li Kurdistanê ne, lê ji destê me ki çiqas tê, —ne şert e em xwe bi xwe pirtükeki derxin— ci ku em zanibin ji mirinê xelazkin û teslimi wan merwan bikin yén ku wan nimûnan çap dikin, dihêlin bona ciwata me ya paşwextiyê.

## Zimanzani

Zimanzani pîseke geleki giring e. Li vêderê ez nikarim dirêj qise bikim hevalno. Pîseke sereke pîrsa rastnivisandinê ye. Bi herfîn latini yek "i" dinivise, yê din nanivise. Xeberêñ bargirani, dîwê yan tevayı bêñ nivisandin, yan ji cihê bêñ nivisandin. Ev du nimûne ne. Ez bi xwe ne zimanzan im, naxwazim giranike geleki mezin hildime ser xwe. Lê problemen zimanziyê yén geleki mezin li pêşîya me sekine.

Van axiriya me du kitêbne baş çapkirine. Du xebatêñ zimanzanê me Maksîmê Xudo ne. Ji vana yek "FERHENGA KURDİ YA FRASOLOGİ" ye, ya din "BINGEHA FRASOLOGİYA KURDİ" ye. Bi awaki ilmi hatine şirovekirin.

Geli hevalan ev pîrs ne tenê pîrsa zimanziyê ye, lê her wîsa pîseke siyasi ye ji. Pîseke me ya rojane ye ji. Anglo gotin derheqa zarava da ye. Ez vê gavê qise dikim, ji min ra geleki giran e, gelo hemû xwişk û birayêñ ku guhda-

riya min dikin sedi sed ji min fam dikin yan nakin.

Pêşiyê ez derheqa kurmanci û sorani da fikra xwe bîbêjim. Ev problema li pêşaya me sekiniye. Ez bi xwe dî rewşa iro da li ser wê fikrê me, ku iro ji sibê ji û pêşerojê ji, wê du çiqlén (şax) zimanê Kurdi yêñ literaturê hebin.

Bila Kurmanci be û Sorani be. Ev ne trajedi ye, ne ji bedbexti ye ji bo me. Gelek miletên dinê hene weki milet yek e, ziman yek e, lê du şaxên wê ên literaturê hene. Şaş e eger yek bêje bila sorani nebe Kurmanci be, yan ji Kurmanci nebe Sorani be. Ez ne wek şiret vitiştî dibêjim. Eva hebûna me, dewlemendiya me dide xuyan.

Hin gotin, peyu dî zaraveki da hene dî é din da tunene. Çêtir e ku zaravêñ Kurdi van gottenan ji hevdu bistinîn, delêva ku ji zimanêñ ciranango ji Erebi û Turki peyvan tevi zimanê me bikin.

Dî vi wari da geleki pêwist e ku şair, niviskar û zimanzanêñ me guhdarike mezîn bidîn ser vê yekê. Duvê em ne tenê li firqin û cudasîyêñ zaravan bigerin, pêwist e em, tiştêñ wek hev, tiştêñ ku me digihinîne hev binin pêş. Gelek şair û niviskarêñ me yêñ xwedan merifet di nava efrandinêñ xwe da guhdarike baş didin ser tékilbûna zaravan.

Em gereke bî fehmdari vê tendensê, vê prensibê pêşda bibin û çiqas karibin zimanê xwe nêziki hev bikin. Miletê Ereban dî vê pirse da nimûneke geleki berbiçav nişandîdin. Gelek zaravêñ wan hene wexta qisekirinê ge-

lek caran çetin ji hevdu fehm dikin, yan ji fehm nakin. Lî dî zimanê Erebi da, hema bêje Erebi gîş ji hevdu fehm dikin. Ev pîrsa li pêşaya me ji sekiniye. Diwê em li ser vê pîrsê ji bisekinîn.

## Edebiyat

Bona min û bî texmina min bona we ji, bona herkeseki ku dî heyra diroka cîmaeta xwe da ye, problemen wê da ye, lêkolin, analiz û çapkirina literatura me ya kevn û nû hesab dibe wek problemeke lap mezîn. Dî vi wari da gelek tişt hatine kîrin, lê gelek hostati û hûnermendiyêñ ku dî nav efrandinêñ niviskarêñ me yêñ mezîn da hene, heta nuha me hela hê nişani ne xwe daye, ne ji nişani gelên dînyayê daye. Gelek kes nîzanîn ku nîvisen Kurdan ên pêşin dî sedsala 7'an da hela hê hebûyc. Em bî xwe hîna sedi sed Ehmedê Xani ê xwe pak nas nakin.

Em çiqas Ehmedê Xani nas dikin û cwqas ji mezînaya wi dibinîn. Mezînaya wi du caran ji hela hê ji aliyê me vâ nayê zanîn. Bi rasti merîv zendegirti dimine ser aqîl û firasetê vi merîvi dî qurna 16 da, dî qurna 17 da.

## Têbini:

Prof. Ş. Xudo dî roja 13'ê meha 11'a li Stockholmê konferans da. Babeta konferansê li ser xebatêñ Kurdzaniyê li Akademiya Ermenistanê bû. Ev nîvisa jorin nêziki temamiya axaftina wi ye.



## Konser

### Jî bo kovara MEDYA GÜNEŞİ

Komita piştgiriya kovara Medya Güneşi dî 13'ê meha 11'a da li Stockholmê ji bo piştgiri û alikariya Medya Güneşi konserek amade kir. Dî şevê da gelek kes û rêxistinêñ pêşverû, welatparêz û demokratik bî besdarbûn û şandina mesajan, piştgiriya xwe nişandan.

Roja Nû ji Komita Piştgiriya Medya Güneşi ra ev mesaja jêrin şand.

Jî Komita Piştgiriya Kovara Medya Güneşi ra



Didemek ji konserê : Şivan PERWER

Em dî xebata jiyandîna kovara Medya Güneşi da piştgiriya we dikin û êris-kari, zordestiya hêzêñ kolonyalist li ser kovarê rûreş dikin, ji Medya Güneşi ra jiyaneke dîrêj daxwaz dikin.

— Pêşeroj ya gelê me ye!

— Bîmre zordestiya faşist û kolonyalist!

ROJA NÛ

Wek tê zanin, pursa perwerdekirina zarokan piskeke giring e û gelek wezifeyên çetin dide ser milê dê û bavan. Ji ber vê yekê me, çend babeten perwerdegariyê hilbijart û em hewl didin ku van babeten han ji devê çend perwerdegarên pispor û bi navdar bigihênin xwendevanen xwe.

Dî vê hejmarê da, me, ji pirtuka "Perwerdegariya Zarokan" (Niwiskar: Anton MAKARENKO, ku di dema iroyin da li seranserê dinê, di warê perwerdegari û kultur da kesê heri bijare ye) babeta "Otoriteya dê û bav" hilbijart û wergerande Kurdi. Ev niwis wê di hejmara dahatû da ji dom bike.

Ji ber ku tûş û armanca niwiskar beri hertiştî ciwata Sovyet e, ew şiret û pêşniyarên xwe li malbaten Sovyeti dike. Lé bêşik rastiyen zanisti û gelempéri li herderê dinyayê rast in.

Em hêvidar in ku dê û bavêni Kurd ji jê berjewendiyê (feyde) bigrin.

Redaksiyona ROJA NÜ

## Li ser otoriteya dê û bavan

Werger: DILSOZ

**OTORİTEYA ZORDEST:** Ne ya heri bî xisar be ji, ya heri bî saw e. Dî rewşek weha da bav, dikevin sergêjayiyê. Eger bav, tim li malê bî hêrs be, li hember súceki bîçük bare bar bîke, heq yan neheq bî qewimandina bûyerekî dest bî lêdanê bike, her xeletiyen zarok ceza bike, wê demê navê vê otoriteyê dibe Otoriteya Zordest. Ev hewa sar û bî saw, ku ji ali bav va tê peydakîrin, hemû malbatê, zarokan, dê di nava türsehêziyê da dihêle. Ji ber ku him li ser zarokan türseki peyda dike him ji dê dike şûna xizmetkaran, bî xisar e. Xisara otoriteyeki weha li ber çav e û pêwist nake ku mirov bîbêje. Tu tesireki xwe yê perwerdekirinê tune, serda ji zarokan ji dê û bav dûr dike. Rê dide derewkariyê. Dî eyni wextê da meyla zarokan diçe ser zahmiyê. Bî vê awayê zarokên ku şasmayi têñ hiştin, dibin kesen bê qerekter, sist, qels-irade û bê rûmet. Zarok bî riya despotiyê (zordestiyê) heyfa dewra zarokatiya xwe, ya ku di bin tade û zulmê da derbas bûye, distinîn. Ev otoriteya heri bê insaf, tenê ji ali kesen cahil (bê kultur) va tê qebûlkirin û bî kar anin, baş e ku di dewra niha da mirov zêde lê rast nayê.

**OTORİTEYA BI MESAFE:** Gelek dê û bav di wê baweriyê da ne ku, dîvê zarok hurmetkar bin, bî wan (zarokan) ra carna bête xeberdan, dî navbera dê - bav û zarokan da mesafe hebe, bî fermandari bête xeberdan. Otoriteyek weha ji ali hin malbaten ronakbirên sere (bî emir) va tê qebûlkirin. Dî malbaten weha da bav, piraniya wextê xwe li oda xebatê der-

bas dike. Pêra ji, wek sermiyanê (serokê) malê hereket dike. Tenê bî serê xwe nan dixwe. Guh dide karêñ xwe yên şexsi. Daxwaziyen derheqa malbatê da, bî riya dê dide xuyakîrin. Dayikêñ weha ji hene. Eleqe, raman û jiyaneki wan ê xweser heye. Dapir yan ji xizmetkar li zarokan dînihêrin. Feyda otoriteyeki weha qet tune û malbateki weha, nikare bîbe malbateki Sovyeti.

**OTORİTEYA KU XWE DISPÊRE HISIYETÊ (Gurûrê):** Mirov dikare wek cûreyek Otoriteya Bi Mesafe bî nav bike. Her hemweltiyeki Sowyet, xwedi hin bawerîyan e. Lé hînek jê xwe pir mezin û giring dibinin. Hisiyyeten xwe, nişani zarokên xwe ji didin. Li male qureti dîkin, li cihê kar ji kiryarêñ xwe zedetir fiyaqe dîkin, bî heyinêñ xwe dipesinîn. Xwe bî ser herkesi ra dibinin. Piri caran zarok ji di bin bandora bavê da dîminin û dikevin atmosfera pesindana xwe. Li ba hevalên xwe bê pesinandin nikarin xwe ragîrin. Dî her fersendi da: " bavê min miroveki weha giring e, bavê min niviskar e, bavê min serbaz e, bavê min ev e û ev e" dibêjin. Dî vê atmosfera rûşûsti da haya bavê ji rewşa zarokan -ku di bin tesira wi da ne tune û têdernaxe ku zarokan çawa perwerde kiriye. Ev otoriteya nebaş, ji ali dê va ji tê pejrandin (qebûlkirin). Bi libaseki balkêş, pêwendiyen giring, rîwitiyên xwe yên modayê dipesinîn. Û bî vê hawê digihêñ baweriki wîsa ku, xwe û zarokên xwe ji yên din (ji xelkê) cûdatır û bî imtiyaztir dibinin.

**OTORİTEYA PIRBÊJİ:** Dı rewşek weha da dê û bav çiqas bı zarakan mijûl bıbin, jı bo perwerdegariya wan xwe biwestinin û cehd bikin ji, jı brokratiyê xilas nabin. Ew, bı piroziya gotinêñ xwe bawerin û dixwazin ku, dı guhdarikirinê da zarok jı wan bitırsın. Bı tewreki rûsar daxwaziyêñ xwe didin xuyakırın. Ew, daxwaziyêñ xwe wek qanûn dibinin û wişa pê bawerin. Zarok dikarin bifikirin ku, bav jı dıkare xeleti bike û bê biryar bımîne. Fikreki weha jı bo dê û bavan tirsehêzi û felaketa heri mezin e. Baveki weha, dema ku bîbêje: "Sîbê wê baran bibare, kes dernayê derva", hewa xweş be ji ger tune. Lewra filmeki li xweşa bav çûye. Eger filmeki baş hebe jı, sine-ma jı zarakan ra hatiye qedexekirin. Zarok jı ali bav hatiye cezakirin. Dema ku piştä bav dikeve zarakan, bı ne gunehbariya zarok bawer e. Lê tu tiştek nikare wi jı biryara wi poşman bike. "Wê bı gotina min be!" Her tewrén zarok, li hember sistemê wek serhildan tê qebûkirin. Jı ber vê yekê ji bav, qaideyêñ nû sere-rast dike. Jiyana zarok, şîklê mezînbûna wi jı çavê bavek weha direve. Dı jiyana malbatê da jı xeyni otoriteyek brokrati tu tiştek bala wi nakşine.

**BI RİYA PERWERDEKIRİNÊ OTORİTE:** Dı rewşek weha da dê û bav, bı xeberdanêñ dûr û dirêj, dagirti û bı izahat jiyanê li zarakan dîkin jehri. Tiştên ku wê bı çend gotinan û bı dîlxweşkirinê bîbêjin, dê yan ji bav, zarok li pêşberi xwe didin rûniştandin û bı xeberdanêñ xwe yên dûr û dirêj wana acız dîkin, xewa wan tinin. Van kesana wisa dizanın ku, xeberdanêñ wan ên "payebilind" bı naveroka xwe pedagojik e. Dı malbateki weha da endamêñ malbatê, rûtiş û békéf in. Bı qasi ku dê û bav dixwazin xwe zana bîdin nişandan ewqas jı zarokên xwe dûr dikevin. Yen hember xwe na-kın şûna mirovîn mezin, jiyana wan ên xwe-ser û bı rûmet jı bir dîkin. Zarok jı mezinan bêtir bı heyecan û daxwaz in. Dûr-dirêj û fireh nafikirin û li gor wi ji hereket nakın. Dı nava zeman da exlaqê fikirandinê distinin. Lê xeberdanêñ dê û bav ên bêdawi, yên acizkirinê hema hema tu bandorek li ser zarakan çenake û dı huşê wan da bı ci nake. Ev metoda dê û bav ya ku xwe dispêre mantıqeki hisk, li ser zarakan otorite peyda nake.

**OTORİTEYA KU XWE DISPÊRE HEZKIRİNÊ:** Dı civata me da otoriteya xelet ya ku

zêdetirin tê bikaranin ev e. Gelek dê û bav bı vê otoriteyê baweri anine. Jı bo ku zarok jı gotina dê û bav dernêñ, jı wan hezbikin, hezkirina wan heq bikin dîvê hezkirina bavê bête nişandan. Zarok jı gotinêñ evini, maçkîrin, şefqet, nêzibûnê bêpar nayê hiştin. Eger zarok jı gotina dê û bav derê hema wê gavê weha tê gotin: "Qey tu jı dê û bavê xwe hezna-ki?" Dê û bav li nava çavêñ zarakan dîmîhérin. Daxwaziyâ hezkirin û şefqetê jı wan (zarakan) dîkin. Piri caran dê, li ba merîvén xwe: "Jı min û bavê xwe gelek hezdike. Wisa zarokeki şîrin e ku..."

Temamiya malbatê nikarin xwe jı diltenikî-yê (İnsiyetê) xilas bikin. Nakevin bin bandora büyerên der û dora xwe. Jı ali perwerdegariyê va hin tiştên giring jı çav direve. Dîvê zarok, jı bo xatrê hezkirina dê û bav çi jı destê wan bê bikin. Ev tewrê han dıkare bibe sedemê gelek tiştên nebaş. Egoistîyeke malbatî peyda dîbe. Hezkirineke weha jı qeweta zarakan der e. Dı nava demeki kurt da têdîgihijin ku wê bikarîbin dê û bav bîxapinin. Jı bo viya ji eleqeyek bîcûk têr dike. Têderdixin ku dê û bav tenê bî rûtişkirinê wan ditırsinin.

Zarok dî bîcûkayıya xwe da têdîgihije ku mirov çawa niyetên baş istismar dike. Jı ber ku wê nikaribe bı qasi endamêñ malbatê û nêzi xwe jı xelkê hezbike, bı hesabek marekori û xwînsari, bê hezkirin bı wan kesan ra dîkeve listikê. Lê carna jı, hezkirina dê û bav dîlî zarakan da bı ci dîbe, lê ica ew jı xelkê dûr dikevin, jı hisen hevalti û dostaniyê bêpar dîminin.

Otoriteyeke weha gelek bı xeter e. Bı vi awayi kesen derewkar, egoist, durû têñ gihan-dîm. Ü piri caran xîsara egoistîyeke weha, dîgi-hije dê û bavan.

**OTORİTEYA DILGERMÎ:** Otoriteya heri kîmaqlı ye. Dı vê rewşê da ji, sernermiya zarakan girêdayi hezkirina ku tê nişandan e. Lê ev hezkirina han jı ramûsan, jı xweşeki —ku şûna şefqetê digire—, jı başiya dê û bav û jı dîlpakiya wan dertê holê. Jı bo zarok, dê û bav wek melek tê xuyanê. Jı bo her tişti mu-sade dîkin. Jı bo dîlxweşkirina zarakan, çi jı destê wan tê dîkin. Çiklos (timeh) ninin. Bı gotina kurt, wek pirlante ne. Jı hemû cûre na-koki û bîlîyan direvin. Bı her awayi li reheti-yeke bê qire-qir digerin. Jı her cûre fedakari ra hazır in. Tişte giring ew e ku, her tişt baş bî-meşe. Dı malbateki weha da zarok, hewl dîdin

ku rêvebiriya dê û bavan bikin. Eger dê û bav li dij derneyên, ji hin daxwaziyên bewext, kapris û her cûre daxwaziyan ra rê tê vekirin. Carna dê yan ji bav, bi awaki qels be ji li dij dertên. Lê mixabin édi her tişt cihê xwe gurtiye. Perwerdegariyeke xirab rûyê xwe nişan da-ye.

**OTORİTEYA BI DOSTANI:** Piri caran dê û bav, berya welîdandina zarok, di navbera xwe da digihêne peymaneki. Buryar dîdin ku bi zarokên xwe ra dostaniyê bajon. Bê guman ev bîryara han, bîryareki gelek positiv e. Bav bi kur ra, dê ji bi zarokên keç ra dikarin bîbin heval. Û dîvê pêwendîyeke weha bête danin. Lê berpirsiyariya rêvebîrîna malbatê dî stuyê dê û bav da ye. Eger dî vê pêwendîya hevalti da bêhediyeke çêbibe perwerdegari dîsekine, yan ji rengeki ters nişan dîde. Wê demê zarok, dê û bavan "perwerde dikin". Malbatên weha, di nav ronakbiran da têن ditin. Dî malbatên weha da zarok, dê û bavan bi navêwan dinasîn, wek Petka yan ji Marussiye û hwd. Bi wan tînazar dikin. Bi corsi xeberdanêwan dibri-

rn. Dî her fersendi da dixwazin ders bîdin wan (dê û bavan). Bi navê guhdarikirina dê û bavan, tiştek li holê namine. Lewra dostaniya rasti, hezkirina duali pêwist dîke.

**OTORİTEYA DEJENEREKIR:** Qerekter xeradîke û otoriteya heri ne baş e. Jî bo ku zaroq bi gotina dê û bavan bikin, têne perûkirin û bi destê wan ra tê berdan (taviz tê dayin). Dê û bav bi tewreki rehet: "Eger tu hurmetkar bi ezê ji te ra caniyek bîstînim, eger tu hurmetkar bi emê herin sirke" dibêjin.


Dî malbatê da ji bo cesaretê, dayina hin perûyan normal e. Mirov dikare wek hin tavizan ji bi nav bike. Mirov, ji bo ku zaroq bi gotina dê û bav bikin û ji wan ra baş bin, bi destê zaroqan ra bernade ango taviz nade û dîvê bi tu awayi ji mirov nede. Jî bo gîhandina encama mijûliyek, mirov dikare hin xebatên pozitiv perû bike. Lê dîvê tiştên wîsa bin ku pêşda bi tu awayi neyên ducarkirin (tekrarkirin) û xebata zarokan yan ji mijûliyek dîn, bi hin wadênen mezîn nekevin re.

(*Dumahik heye*)



H. CINDI

C. CELİL



### Du dersdar û bireweren çand û edebiyata Kurdi, Prof. Hecîyê CINDI û Casimê CELİL isal bûn 80 sali

Du mamoste û zehmetkêşen çand û edebiyata Kurdi, Casimê Celil û prof. Hecîyê Cindi isal bûn 80 sali. Em bi navê Roja Nû û xwendevanên R.N. 80 saliya herdu mamos-teyên eziz û payebilind piroz dikin. Jî wan ra xweşî û sihetekê baş daxwaz dikin û em dibêjin:

Xebat û xizmeta ku we heta nuha ji gelê xwe ra kîriye û hûn dikin, geleki giranbuha

ne, û bi gotinan nayêni pivandin. Gelê Kurd her dem bi ewladêni xwe yên bi xiret û emekdar serbilind e. Her Kurdeki welathîz, ku bi xebat û xizmeten we ra dibe nas, serbilind û dîlxweş dibe.

Jî Kurdistanê û ji derveyi welat, hezar û hezar cari slav û evinê me ji we dersdarên me yên mezîn ra hene. 80 Saliya we piroz be!

Redaksiyona ROJA NÛ

# *çend çarın*

BARAN

Lı wîr e, lı welat, hêvi, azadi û evin  
Lı bîlqokên avê, lı dor çemê zîvin  
Jîyan hat û çû, mina bayek bû  
Mina kîlamek lı darîstana rengin

\* \* \*

Mîrin bîla bê, lı ser seran ser çavane  
Mîn para xwe da û girt jî jiyane  
Ne zêr û ziv, ne tac û text, nav-nışan  
Hêfa mîn bî wan rengan tê, bî wan dengane

\* \* \*

Delalê, rûyê te mina ezmanê şin e  
Ba bî pelgan dîlize, av dîlorine  
Rêvîngi bî hespên sor ajotin çûn  
Lı çiyayêن Şerafettin, dem havin e

\* \* \*

Dema roj hîltê, roj dîçe avan  
Dîmeşin, deng dîdîn çîvik, pez û şivan  
Jîyan tewneke rengin e, kîlameke dîrêj  
Dîrêsin, dîbêjin av û dar, roj û insan

\* \* \*

Ne bes <sup>e</sup> a ax û dargul, jê ra gulzan dîvê  
Şîrê xas ra dîldar û hozan dîvê  
Dî zîkê her sedefkisiki da mîrcan çê nabe  
Jî kar ra hoste, jî hoste ra zeman dîvê

\* \* \*

Rojêñ reş bî kar û xebatê şin ke  
Qehwa tal bî sohbete şirin ke  
Gewherê heri mezin lı dînê naveki baş e  
Dora te hat û çû, camêro, hespa xwe zin ke!

# JI DİROKA KURDISTANÊ

Jı Gernama  
EWLİYA ÇELEBİ



## JI DİYARBEKİRÊ HETA BİTLISÊ

Werger: DILSOZ

Ewil Diyarbekir, em jı pira ser Çemê Şat bı kelekan derbas bün.


Kelek, dı bin van pıran da têne sazkırın, wezifa keştiyan (gemiyan) dibinin û ji meşkan çedbîn ku ser wan bı textan tê girtin; hesp, xali û xaliçe hetta mirov tevi hezar kiloyan barê xwe yê giran li wan siwar dibin, pala xwe dîdin caxê çarkenarê wan, listika tawla û satrancan dileyizîn, der û dor temaşe dikin û carna ji li texma gundên şen dîsekînin û xwarîn û vexwarînê metbaxêwan gundan di-xwun. Bı vi awayi heta ku mirov dighiye Bexda û Basrayê bı xêr û xwêşî dice.

Wisa keştiyên nediti ne ku, keştivanêwan yêna hosta û taybeti ne. Li Diyarbekir dı bin vi pîre da gelek kelek hazır dîsekînin.

Em jı vê pira bîçûk derbas bün, dı navbera bakûr û rojhîlat da bı qasi saetek meşîyan û li texma gundê Sadi sekînin. Ev beriya bı gul û

çiçek, ev gundê bı bax û baxçe û şen, yê fileha ye. Lé dizên wi pîr in. Wê şevê barê konek hate dizin lê şikir ji Xwedê ra me ji wan stend. Ü me du diz kuştin.

... Em jı Kela Mayafarqinê (Farqin, Siliva) berbi bakûr çûn, ji pira Batmanê, ku mirov ji seyra wi têr nedîbû, derbas bün û sekînin. Gava mirov ji vi pîre derbas dibe av wisa bı zerp û gurr diherike ku, guhê insan kerr dibe. Lewra li vê derê av bı ser latênekpare û bêsitûn (bilind) derbas dibe. Jı ber ku ev pira han riya Diyarbekir, Mayafarqin, Hazo, Bitlis, Wan û gelek cihêñ din bû, mirovek ji nifşa Abbasi ji malê xwe yê helal sê hezar kis (pere yan ji zér) serf dike, gelek mimar û karkeran dicivine û pirek wisa mezîn û giranbuha dide avakîrin, ku bı stila lêkirina xwe, çêkirin û rewşa xwe, bejn û bala xwe û bı qewibûna xwe ji hemû pîren Enedoliyê payebilindir e. Aliki çem zi-



nar, aliki ji qüm e.

Hostayê pirê: "Lî ser vê çemê han, ji xeyni çêkirina pireki tu ilacek nine" dîbêje û li herdu rexê pirê, li ser bingehek qewi wîsa asas û qolonên fireh davêje ku dibe nimûneyek ji Takî Kesra û ji gelek dûri va dibe rîberek xuyakırı. Ji seriki pirê heta serê din tam 73 gav e. Wek tê zanin li diyarê Hersekê pira Mostar ji çavîyek e, lê mimari û zerafeta vi pira han dî tu pirek bî nav û deng da tune ye. Herweha Xwedê dizane ku ez di vê gera han da emrê xwe yê giranbuha dîqedinim, min pirek weha xweşik û bî hebat neditiye.

Kesên ku ilmê astronomi, fizikê dixwinin û bî qewimandinênek nekifşkiri bawerîn nikarin ji vê pirê derbas bibin. Dî dawiyê da wê ji meşkan kelek û botan çêkin û bî wi hawê derbas bibin. Lewra mirov çîqas berbî zirveya pirê hildikşe ewqas pir, ji aliye hostayê pirê hatiye ziravkirin ku mirov cesaret nake li jêr binhêre. Lî jêra wi gelek fireh e. Lî herdu aliye pirê wek derê kelehan du derê hesini heye. Dema ku mirov ji deriyan dikeve hundir li milên çep û rastê dî nav asasê pirê û binê pirê da gelek xan (ode) hene ku, kesên ku ji der û dor têni van odayan dibin mîvan û bêhna xwe didin. Dî bin kembera pirê da ji çend ode hene. Dî balkonên şivakên hesini da mîvan radiwestin û hîmek jê bî kesên ku dî şivakên hember da rûniştine dikevin laqirdiyan, hin jê ji bî tor û şewkan masiyan dîgrin. Dî çep û rastê vê pirê da hêj gelek odayen bî şivak hene. Hostayê delal hemû hunermendiya xwe bî kar anîye.

Hemû qolonên ku li rast û çepê pirê ne ji polaya Naxşivanî ne. Lî hostayê hesinker hemû hunermendi û qeweta xwe bî kar anîye û bî hostati qolonên hesini lêkiriye, hostatiya des-têni xwe dî vê eserê da daye nişandan.

Lî odaya vê pira bêhempa ya ku li ali Hazoda, peyayê Begê Hazo dîminin û ji rîwiyêni aliye xwe (rîwiyêni ku ji ali wan va dicin-têni) bac distinn. Lî ali Mayafarqinê ji, peyayê Begê Mayafarqin bac distinn.

.....Em ji vê derê derbas bûn û gihan Kela Hazoyê.

Şikir ji Xwedê ra ku me û Melek Ahmet Paşa hevdû dit û piştî destramûsanê Waliyê Diyarbekir Mustafa Paşayê Firari, nameyên xwe teslim kîr û wek ku dî namê da nîvisandi bû me emanetan teslim kîr. Gelek şâ bû û hemma wê gavê sih û heft (37) kis li peya û eskerên xwe belavkir.

Lî wan cihêن asê, nuşkava eskerên Evdal Xan xuyabûn. Evdal Xan ji hespê xwe peya bû û berbî Paşa hat, gîhişt pêşberi wi. Paşa ji ji hespê xwe yê bezayı peya bû û herdûyan hevdû hemêz kîr, cûn rûyêni hev û piştî xweşbêşiyek dîrêj, Evdal Xan got:

— Sultanê min, li hespê xwe siwar bîbe û li pêş taştêke me bixwe, got.

Piştî Paşa, li hespê xwe siwar bû û tevi alaya eskerên xwe bî rî ket. Wê gavê me dit, ku dî newaleki şin da konê dirim yêni Ecemi, Türkmeni û Kurdiyi û dîgel wan ji konêni Osmani yêni mezîn hatîne vegirtin, ku wê derê rengin û geş kîribû.

Dema ku Paşa giha wê cihê xweş û konê xwe vegirt, yek bî yek bî lengeri, kase û tebeqên Çini û furaqên ziv û zér ziyafetek hatiye raxıstın. Ev xwarına bî bin û xweş ji ali tu sultaneki va, hetta ji ali Cemşid, İskender û Keykavus va ji nehatiye raxıstın. Jî Xwedê va eyan e ku, ew xwarına ku hatibû raxıstın têri sê hezar eskerên Melek Ahmet Paşa, sê hezar eskerên Evdal Xan, bajarvaniyênu ku hatibûn xêrhatinê, Kurdêñ der û dor kur û bî hezaran tebeqên xwarinê yê cûrbecûr ji hatin rêtin. Pişti xwarinê Evdal Xan, dozde kurên wi û heftê û heft serokeşirên gûrêdayi wi, li ber Paşa xwar bûn û wi rîwi kîrin.

Evdal Xan got:

— Maqûlê min, ev heft kon û çadîrên ku hûn lê rûniştin, xêrhatina we ye; pênci sihanen zivin, sed tebeqên Çini, xali û xaliçê, çêni û çaydankên ku hatine pêşberi we hemû yê Sultanê min in, qebûl bîkin. Jî xeyni vana çar xorten Çerkez, çar Abaza û çar Gurci ji koleyê sultanê min in, got û destê Paşa ramusa.

Paşa ji, ji ber kembera xwe xencerek ji xenceren Sultan Mûrat Xan derxist û bî destê xwe li pişta Evdal Xan gûrêda, piştre kurkek da Xan û sê kurk ji da kurên wi; sed û heftê xeftanen kemberzêr bî mirovên dora Evdal Xan da li xwe kîrin, paşê li hespê xwe siwar bû û bî bando, bî ser gaz û newalan da gihişt bajarê ezim - Bitlisê û li baxê Evdal Xan deh roj bû mîvan.

(Di vê mîvandariyê da dema ku Melek Ahmet Paşa gotinêni bî şiret ji Evdal Xan ra dîbêje, Evdal Xan difikire ku wê M.A.Paşa manale bigere, xwe amade dike. Pişti ku Paşa berbi Wanê dikeve re Evdal Xan, ji Ewliya Çelebi dixwaze ku çend roj li balê bimine. Di vê navberê da tiştên dîlê xwe ji Ewliya Çelebi ra dîréje:) (\*)

— Ewliyayê min, tu ji dibini ku Paşayê we kina xwe yê bî qasi barê deveyan li hember me da xuyakîrin û li Rehwayê (Deşta Rehwayê di navbera Müşê û Bitlisê da ye) di konê xwe da tenê rûyê xwe nişani me da û di şiretên xwe da, meselên 20 - 30 sali li rûyê me xist. Dîvî mirov, xwe ji vi Paşayê we bîparêze.

Min di ber dîlê wi da:

— Xanê min, bî Xwedê Paşa ji te xweş e. Jî ber ku ji te pîr hez dike hin şiret û weki din li te kiriye. Nebe ku tu xwe ji gotinêni wi bixe-

yidini. Vê derê Kurdistan e. Gelê we qewmeki Rojegiyan û bî rîk e. Alikî me qewmê Wanê ye. Jî bo ku hin xerab nekevin navbera we û li diji aşitîyê tişt çênebin, Paşayê birayê we, ji hezkırma xwe ji Xanê min ra hin gotinêni şiretê gotiye. Xanê min, gerek hûn ji wan gotinan kêfxweş bibin. Nexwe Paşa, ji kin, qureti û dijminatiyê dûr e; serwerek comerd û jir e, û herweha min gelek pesnê Paşa da.


Evdal Xan ji van gotinan gelek xeyidi û bêdeng ma.

Bî kurti min, bî E.Xan û gelekê din ra sê roj suhbet kîr. Eger ez, behsa kîf, temâşe û xweşiya ku me her roj dîdit bîkim û bînîvisim topek kaxez têr nake. Roja çaran Xanê bi şan û şeref, qedrê mezinahiya vi feqirê hanê gûrt: Ewil kurkeki ku bî ebayê şin pêçayı paşê ji, serapê qatek cil, kiseke guruş, du hespê bezayi, zineki bî qedife û simkiri, rext û şüreki dûdev, hespeke kehêl tevi caniya wê û hespeke din wek diyari da min. Û xulameke Gurci tevi çek û libas, silah û hespek hibe kîr. Çarde kurên E.Xan yên şêxzade, merivêni Xan wek Çaker Axa, Heyder Axa, Ereb Xelil Axa... bî kurti hemû eşraf û serokeşiran şûr, xencer, tiying, zîrx, mertal, piştbend, serbend û gelek tiştên din diyari kîrin, ku min bî vi awayi sê selik cil û heft hespêni kehêl bî dest xist. Sultana keça Zal Paşa ku ehlê E.Xan bû (wîsa xuyaye ku Sultan, jîna E.Xan bî xwe ye), dî navâ boxceki simkiri da qatek cilên paqîj û 300 quruş şand. Bî kurti min, ji her tiştî nisibê xwe gûrt, li ba E.Xan ji felekê çend rojan çîrpand, bî serokeşiran ra suhbetan kîr, kîfîn Huseyin Baykara kîr û ji hemû dost û Xanê bî şan û şeref xatûra xwest, nameyan wergirt û berbi Wanê bî rî ketim. (1065, Şaban gurre - 1655, Heziran)

(Gernama, cild IV, rû: 71 - 128)

(\*) Di vê beşa Gernama Ewliya Çelebi da, xuyaye ku hin beşen din ji hene. Lî sererastkirê nîvisen E.Çelebi (M.N.Özön), di ser hin beşan da qebaz daye û van beşan di nav parantêzê da bî kurti daye xuyan.

# KOLONYALİST BARBARIYÊN HEV DINIXÊMIN



Wek tê zanin û hemû dinya ji pê hisiya, pişti agurbırına navbera Iraq û Iranê rejîma faşist a Iraqê, bî hemû qewet û hêzên xwe êrişike gîran ani ser gelê Kurd û bî armanca kok-birkirîna wan bi tonan gazên jehrê, napalm û çekêن kimyayı bî kar ani. Bî vê êrişê, bî hezaran gund hatin kambaxkirin, bî hezaran jin, zarok û mîr hatin kuştin û seqetkirin. Cihênu bî gazên jehrê, napalm û çekên kimyayı hatin şewitandin, tovê jiyanê lê hate birin.

Jî ber vê êrişê nêzi 100 hezar Kurd –zêdetir ji jin, zarok û kal-pir – derbasi Kurdistan Bakûr (Kurdistana Tîrkiyê) û Iranê bûn. Bêşik gelê me bî hemd û raya xwe terka welatê xwe nekrû jî koçemaliyê ji, qet hez nake. Lê mi-xabin, dewr ji wan ra xirab geriyabû, barbariya dijmin û bî taybeti ji çekên kimyayı wana mecbûre penaberiyê kîribû.

Dewleta kolonyalist a Tîrkiyê, dî qebûlkirîna penaberên Kurd da jî destpêkê duduli nişan da û jî bo hin hesabêñ xwe yên bî qilêr qebûl kîr. Em baş pê dizanin ku, dewleta dagirker tucar xêra gelê me nexwestiye û herwîha qebûlkirîna penaberan ne bî armanca humanisti û xêrxwaziyê ye. Çend sedemêñ qebûlkirînê ew bûn, ku lî Tîrkiyê referandûmek hebû û ev referandum qedera hukumeta Ozal tayin dikir. Anglo ihtiyaciya wi bî rayêñ gelê Kurd û Türk hebû; itibara Tîrkiyê lî Ewrûpayê şikan-dibû û jî ber vê yekê ji, rewşa hukumeta Ozal roj bî roj xirabtir dibû –ku jî berêvki da dî xwestin bîkevin Parlamentoya Ewrûpayê û hin saziyêñ navnetewi-. Sedemek din ji, em barîn ku bî bandora Emrika û hin hesabêñ wi

yên lî ser Rojhîhilata Navin bû.. Anglo qebûlkirîna gelê me, ji xapandinê pêştir tiştek ninbû. Û ji xwe "humanisti"ya dewleta dagirker pîr domnekir, jî rojê ewîl da rûyê xwe yê nijad-peresti û dijmînîtyê nişan da.

## Tîrkiye, Peymanêñ Navnetewi Dîde Nav Lingan

Tîrkiye, bî demagoji û derewan barbariya xwe dimixême. Peymanêñ navnetewi dîde nav lingan, Kurdan ji heqê penaberiyê mehrûm dihêle. Ew bî xwe alikariyê nake û serda ji, pêşîya alikariya saziyêñ navnetewi û gelê me dibire.

Gelê me yên penaber, li derva dî bm baran û serma hîşk da hatine hesarkirin. Dora wan bî têlan, bî esker û polês hatiye girtin. Gelek ji wan bê star û betaniye ne. Alikariya ku jî gelê me yê Kurdistanâ Tîrkiyê, jî humanistên Türk û welatên dereke têñ, nagîhije penaberan û serda ji, Wezirê Daxili yê Tîrkiyê bî fermananriya alikariyê qut dîke, sazi û kesen ku beşdarî kampanyayêñ alikariyê dibin dîde girtin û tîrsandîn.

## Tîrkiye, Bîkaranîna Çekên Kimyayı, Gazêñ Jehrê İnkâr Dîke

Bî hezaran jin, zarok û kesen ku birindarê gazêñ jehrê û çekên kimyayı ne, tu alikariyek nabinin, bîrinêñ wan nayê dermankirin. Hin



komikênu ji Ewrûpayê û derênu din tênu û diwazin alikariya burindaran bikin, bikaranina çekênu kimyayı tesbit bikin, gelek astengiyê hukumeta rûreş a Tirkîye li pêşîya xwe dibin û nikarin xwe bigihinun penaberan. Hukumeta nijadperest, li pêşberi hemû dînyayê bikaranina gazênu jehrê û çekênu kimyayı inkar dike, barbariya Rejima Saddam dînixême, vedîşêre. Herweha tarix cardin nişan dide ku, dagırkeren Kurdistan li hember gelê Kurd bi her awayi karbîdestiya hev dikin, eybêne hevdû vedîşerîn.

Hin heyetên bijikan (doktoran) hewl dîdin ku alikariya penaberan bikin, bûrinênu wan derman bikin, saziyên tibbi ji penaberan ra saz bikin. Lî hukumeta karbîdest û rûreş re nade wan. Daxuyaniya Medico International Li Elmanya Federal, bi awaki aşkera hovitiya Tirkîye derdixe meydanê, bikaranina çekênu kimyayı ispat dike:

### DAXUYANIYA MEDICO INTERNATIONAL

Bir û raya heyeta Medico International li ser kampênu penaberênu Kurd —li Rojhîlatê Tirkîye— û rewşa wan:

"Hukumeta Tirk, musade nedaye gelek bijikênu Elman ku herin kampênu penaberênu Kurd û li wê derê bixebeitin.

Kampênu ji penaberênu Kurd ra hatine hazirkirin, qels in.

Penaberênu ku hatine hêla Çukurca û Serves (Çolemerg yan ji Hekkari), li derva dimînin, ji bo starê ji xwe ra ji daran holik çêdîkin.

Bî rojê germek ecêb, bî şevê ji —5 derece serma û baran, bî taybeti agrê zarokênu jar bîlind dike û dibe sedemê nexweşinênu xeter.

Hukumeta Tirk, re nade saziyên navnetewi yênu alikariyê ku dezgâyên tibbi saz bikin.

Nêzbûna ziwistana xeddar, ku serma dertê —30 derece, kembûna xwarin û imkanênu tibbi şansê jiyanê ji holê radike ji bo van insanan.


Tîrsa me ew e ku xeterênu civaki li pêşîya van insanan e.

Wek Medico International ev 5 sal e ku em li Kurdistanâ Iraqê ji bo çêkirina dezgâyek tibbi dixebeitin.

Di destânu ewil da me, li hember gazênu jehrê maskeyên parastinê şand.

Em, ji bo alikariya Kurdistan banga lez û bez (acil) dikin!

Berpîrsiyarê Medico International HANS BREITSCHÉIDT, di destpêka bûyerên dawi yênu Kurdistanâ Iraq da diçe Kurdistanê û tiş-



tênu bi çavênu xwe dibine, di Rojnama Frankfurter Rundshau (ku li Elmanya Federal rojnama heri mezin e) da dide neşirkirin. Em hin parçeyênu vê nivisê pêşkêsi xwendevanênu xwe dikin:

*"Balafirênu bombeavêj yênu ku gazênu jehrê hildigrin, di du periyodi da bombe dibarin. Dengê motorênu ku li geliyênu Kurdistanê yênu asê da belav dibe, nişana balafirênu bombeavêj in."*

*"Di periyoda ewil da balafirênu ku tik ji erdê radibin, bombeyen ku qeweta wan ê kam-baxkîrinê gelek zêde ye bi ser cih û warênu Kurdistanê da —ku di şerê 12 salan da li piya mane— dibarin. Di nav van dengê teqin ê tirsehêz da Kurd, ji bo parastinê dikevin zeminê xaniyan, xwe davêjin şikeft û newalênu kûr. Lî ev starênu han paşê li wan dîbin bela, dîbin faq."*

*"Di periyoda duduwan da balafirênu bombeavêj, varilênu ku bi gazênu jehrê tiji ne davêjin. Dema ku varil li erdê dikevin, koxênu (qapsûl) wan diteqin û qapaxê wan vedibin. Dûmanâ gazênu jehrê, di nava çend deqqeyan da li der û dor belav dibe û hawirdor dike binê bandora xwe. Ji ber ku gaz ji hewayê grantur e, bi taybeti li şikeft, newalênu kûr û zeminê xaniyan belav dibe û wan dera dike binê bandora xwe."*

*"Kesênu ku di staran da ne, bi tatêla canê xwe bi lez û bez ji staran dipekin û berbi gazzan, cihênu bîlind bazidin. Lî ordiya Iraqê bi metodek nû ériş dike; li ser hev bombeyan dibarine û bi vi awayi li kaşan ji gazê diwarek peyda dike. Însanênu ku tenê bi potek şil dev û pozê xwe digrin, nişkava xwe di nava diwarê gazê da dîbinin."*

(.....)

*"Tesira bombeyen gaza HARDAL: TA-*

*BUN: SİYANUR, ecêb tursehêz e. Birindarên gazê, bî vereşandin li erdê dikevin û çermê wan bî carekê reş dîbin. Bi parçebûna alyûvarênen nava xwinê, pişik dest bî rizandinê dike. Yênu ku bî jehrê dikevin, ne dikarin nan bi xwin ne ji dikarin razên. Têlê dengê wan diqete û bî carekê tê birin. Dî dawiyê da insan, bî ezab dipirpitin û dimrin. Mirinek bî êşkence!.. Tenê maskeyên gazê ji, têr nake. Gaz, ji çerm ji derbasi laşê insan dibe."*

(.....)

"Diplomateki ku vê pîrsê ji nêz va nasdike weha dibêje: "Ali tursehêziya vê kiryarê, ne ku Iraq tenê carna bombeyên kimyayı bî kartine, ew, bikaranina bombeyên gazê kiryê parçeyek stratejiya şer ji xwe ra." "

(.....)

"Erdén bî bereket yêni welatê Dicle û Fırat, reş û tari bûye. Rejima Bexdayê, ji bo qutkirina imkanen veşartin û starbûna Pêşmerge tebiyetê dışewitine, kambax dike. Bi vi awayi, olaxen jiyana Kurdan ji holê tê rakîrin. 600 hezar gundiyyen Kurd, berbi Başûrê Iraqê, berbi çolên xir û xali hatine nefikirin. 4 hezar

dînyayê aşkera dike... Em cardin vegevî ser rewşa penaberêne Kurd.

Pêwendiyê penaberêne Kurd û rojnamevanan hatiye qedexekirin. Riya dan û stendinê bî bineciye hawîdor ra hatiye girtin. Ji ber bîrcibûn, hewa sar û şertên gran heta niha bî dehan zarok mirin. Ji niha va germi daketiye binê sıfirê; zivistana bî saw, berf û bahoz iro-sibê tê.

Hertişt aşkera lî holê ye. Dewleta dagırker û faşist a Tirkîyê, bî çavê dijminatiye li gelê me dînihêre. Esker û polêsên wi li hember penaberan teroristi dike. Ji ber vê yekê ji, gelek caran dî navbera penaber û esker - polêsan da şer dertê; penaber têne gullebarankirin, kutan û girtin.

Hukumeta Ozal, bî her awayi karbidestiya rejima Saddam a faşist dike. Ü hewl dide ku gelê me yan li kampê hêsiriyê, dî bin şertên gran da bikuje yan ji teslimê barbarên Iraqê bike. Xuyaye ku, eger hukumeta Türk penaberan li Ewrûpayê, İranê û hin derê din belav neke, wê teslimê Saddamê xwinrij bike. Hetta ji niha va 950 kes hatine teslimkirin û teslimkiri-




gund ji bini hatine wérankirin. Ji bo çékirina xaniyên nû, musade tûne, tenê bî şerteki heye ew ji, diwê li rexê garnizonen eskeri be! Li welatê Dicle û Fırat, kambaxkirina tebiyetê gihiştiye hedê dawi. Şewitandina daristanan —ku bermayıyyen sedsalan in— dereca erozyonê bilind kiriye. Bax û baxçeyen ku têda tiri, sêv, zerzewat û cûrbecûr hêşinahi çêdibin, bê xwedi mane."

Herweha, daxuyaniya Medico International û bir raya berpîsiyare wi li ser kambaxkirina Kurdistanê û qırkıma gelê Kurd, hemû derew, demagoji û dek û dolavan pûc dike, bêdengiya

na yêni mayin ji ne dûr e!..

Divê hemû dînya bizanibe ku, dewleta dagırker çawa berê navê wi bî barbarî derketibû û wisa dihate naskirin, iro ji ji barbariya xwe tiştek kêm nekiriye û lî pêş çavê hemû dînya-yê derew û demagojiyên xwe didomine. Heta kengê wê wê welatên dereke çavên xwe ji qırkıma gelê Kurd ra bigre? Aşiti, heqê mirovi, rizgarbûna gelên bindest bî vê hawê nayê parastin. Helbet gelê Kurd wê ji van bûyeran û ji tewrê dewletan dersek derxe. Gelê Kurd, gelek bûyer û jenosidêne weha ditine. Lê tu qewet û hêz nikaribûne agirê azadiyê vemirinin û wê nikaribin vemirinin ji.



## dı zindanê fasîst da GREVA BIRÇİBÛNÊ

### XEBAT

Piştî hatına cûnta faşist ser hukum li Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê da tade, lêdan û êşkence bû parçeyek jî jiyana gelê me. Ev dijwariya xasîma di hepsan da lî ser girtîyan gîhişte merheleke pir bilind. Jî ber kîrinêñ dijmin, dı zindanan da bî sedan kes hate qetîkîrûn û hezaran kes jî jî ber lêdan û işkencan se-qet man.

Rejima faşist van kîrinêñ xwe ên ho-vi, isal 8 sal e ku bê westan lî ser girtîyen siyasi bî kar tine.

Dewleta Türk jî bîryar û usûlêñ nav-tewi ra tu caran hurmet nake û jî zûda wê kiriye bin lingan.

Dı binê hin bîryaran da imza xwe he-be ji, tu wextekê weka dewleteke bî demokrasiyê ra gîredayî jî mafêñ mirovati ra hurmetkar nefikiriye.. Jî ber ku ev bîryar, bî baweri nehatine qebûlkîrin.

Ev jî bo derbaskırına hin astengîyan, bî taktiki hatîne çêkîrin.

Îro bî hezaran girtiyêñ Kurd û Türk dı seranserê Tirkîyê û Kurdistanê da dı zindanan da jî bo parastina heysiyeta mirovati, jî bo parastina heqêñ xwe yê mirovati bî hevra dengê xwe derdixin û lî hember faşizmê seri rakirine...

Jî Eskişehirê heta Diyarbekirê hemû girtigehêñ faşistan da têkoşina mirin û jîyanê didin.

Jî 17'ê Cotmehê (Oktober) vîrda dı 17 hepisxanan da 2000 girtiyêñ politik ketin greva birçibûnê.

Pircaran greva birçibûnê hate çêkîrin. Salekê berê jî, dı hepsan da greva birçibûnê hatibû çêkîrin. Dı wê bûyerê da hin kesan canê xwe jî da...

Jî bo demek kurt hin daxwazên girtîyan hatîne qebûlkîrin. Lê hukumeta fa-

şist bî vê qail nebû, lî gotinêñ xwe poşman bû. Bî navê "Bîryarêñ (genelge) 1'ê Tebaxê" şertêñ gîrantır anin pêşberi hepsiyan.

Jî ber vê yekê bî hezaran gîrtiyêñ siyasi lî hember vê bîryarê (genelgê) rawestîyan û ketin greva birçibûnê.

Daxwaziyêñ gîrtiyan, bî kurti ev in:

- *Bila "Genelga 1'ê Tebaxê" bê rakîrin.*
- *Kincêñ yek-tip û zincirkîrun bê rakîrin.*
- *Qisekirina zimanê dê bila serbest be.*
- *Bila kutan û işkence nemine.*
- *Qedexa radyo, teyip û daktilo bê rakîrin.*
- *Hevditîna gîrtiyan û avûkatêñ wan bila serbest be.*
- *Qedexa pirtûk, rojname-kovaran bê rakîrin.*
- *Xwarina ku malbatêñ gîrtiyan ji wan ra tinin, bila serbest biye hundır.. Û hin daxwazêñ wek van...*

Ev daxwaziyêñ jorin, lî welatêñ Ewrûpayê, jî zûda hatîne qebûlkîrin. Lê rejîma faşist jî aliki va dîxwaze xwe tevi welatêñ Ewrûpayê bîke, jî aliki va ji van barbaryêñ xwe didomine.

Berdevkîn rejîma faşist û Wezirê Endaletê, mina dijmîn lî gîrtiyan mîze dîkin. Ew jî bo çarelekîna daxwazêñ hepsiyan cehd nakîn, serda ji rewşa gîryan xîrabtîr dîkin. Jî ber vê yekê, dayîna ava bî şekir û xwê jî kesêñ rojigirtîra qedexe kîrine. Jî bo ku ew, zûtîr bêtaqet bibin û jî gelek nexweşîyan ra ji rî bê vekîrin.

Malbat, heval û hogîrên gîrtiyan dîxwestîn ku hîn meqamêñ xwedi insaf û bî mesûliyet bîbinin û pêşiyê lî bûyerêñ nebaş bîgrin. Ew çûne parlamentojê û xwestîn ku bî parti û kesêñ siyasi ra pêwendî deynin û bala wan bîkşînin ser rewşa hepsan.

Nêziki 6 saetan dî parlamentojê da, dî salona ANAP'ê da rûniştin. Daxwaza wan ew bû ku, jî nûnereki hukumetê agahdari derheqa gîrtiyêñ rojigirtî da bîstînin û hukumet hêviyeki bîde wan. Lê tu kesi ew guhdari nekîrin. Hukumetê xwe kerr û kor kîr. Piştre ji, bî ferma wan, malbatêñ gîrtiyan bî destê polêsan jî parlamentojê hatîne dûrxistin û gîrtin.

Lê parti û rêxistinêñ demokrat, sosyalist, kesêñ aşitixwaz û demokrat li hember rûreşiyêñ rejîma faşist bê deng neman, piştgiriya gîrtiyan bî xurtî kîrin û dîkin; bî cure cure awayan xwestîn, bala hukumetê bîkşînin ser gîrtiyan. Jî ber vê yekê ji, him lî welat û him ji lî dervayı welat gelek xebat û xwepêşandînê protestoyê hatîn kîrin.

Gîrtiyêñ me, jî bo jiyanek nû û delal xwe fedâ kîrine. Jî ber ku ew, lî hember zordari û talanê derketîne, iro dî hundur da ne.

Ew dî hepsê da ji, bî serbîlindi jiyanâ xwe pêşkêşî şerefa insaniyete dîkin, berxwedanek nedîti dajon. Heq dîparêzin, rastiyê dîparêzin.

Em bawer in ku, wê şerê gîrtiyêñ me, têkoşîna gelê me dûr yan nêz bigîhê armanca xwe, bêdengiya dînyayê bîçirine.

- Bila Bîryarêñ 1'ê Tebaxê bê rakîrin!*
- Bila dî zindanan da işkence neyêñ kîrin!*
- Jî gîrtiyan ra azadi!*
- Zindan bila valabîn!*

# Jİ NAVU DOKTORYA CİHANE



**Ernest Hemingway**  
(1898-1961)

Niwiskareki Amerikayê (DAY) ê bî nav û deng e. Kurê doktoreki ye. Bî daxwaza xwe, wek şoforê ambûlansê dikeve nav şerê Cihanê Yekemin. Di şer da birindar dibe. Paşê di Şerê İspanyayê û hundiri û Şerê Cihanê ê Duwemin da, ji rojnameyên Ameriki ra nûçegihaniyê dike.

Di pirtükên Hemingway da, leşkerên herdu şerên cihanê derdikevin hember xwendevanên wi; mirov bi grûbek partizan ra di Şerê İspanyayê da diji, rasti pêxwas, boksor û gangsterên Amerikayê tê, an ji li Afrikayê nêçira heywanen kûvi dike. Di gişkan da mérxasê bûyerê bî jiyana xwe ne emin e, mirin hertim ji rastiyê ji nêziktr e.

Hemingway wek niwiskareki "pir piyyayi" tê bî navkirin. Di sala 1954'an da xelata Nobelê wergirtiye.

Me serpêhatiyeke wi wergerande Kurdi û li jêrê pêşkêşi xwendevanan dîkin.

## WARÊ İNDİYANAN

Werger ji swêdi: X. LEZGIN

- Em kuda dicim bavo? Nick pırsı.
- Emê herin warê İndiyanan, lî aliyê din. Jineke indiyan pir neweş e lî wêderê.
- Aha, got Nick.

Lî aliyê din ê delav, keleka (bot) din li ber qeraxê avê sekini bû. Apê George li pê sekini bû û dî tariyê da cigare dikışand. Xortê indiyan kelek ji nav avê pariki kaşkîr derxist ser erdê. Apê George cigare pêşkêşi herdu xor-tê indiyan kîr.

Ew ji kenarê avê dûrketin cûn nav mîrgeki ku ji xûnavê geleki şîl bûbû; lî pêş xortê indiyan dimeşıya, dî dest da fanosek. Paşê ketin nav daristanê û xwe lî şîverêyeki girtin ya ku paşê digihişte riya esasi a mezin û hevraz û dî-

çû çiyê. Lî ser riya mezin bêtir ronahi bû, ji ber ku li herdu aliyêne rê ji daristan hatibû bîrrin. Xortê indiyan sekini û pufi fanosê kîr, temirand û bî hevra li dûv wê rîyê cûn.

Jî çivaneka rîyekî derbas bûn û kuçikeki derket derva û ewtiya wan. Lî hemberi wan, ji barakêni indiyanan yên ku têda karkerên sîpi-kirina qaçîlê daran diman, ronahiyek dîçirisi. Komeke kûçikan êrişî wan kîr. Herdu indiyanan pêşî li wan girtin û ew birin xustun hundurê barakan. Dî barakêni devê rê da, ji pencereki ronahi xwiya dikir. Pirejnek dî navbera deri da sekünibû û bî desteki lampek bîlind girtibû.

Lî ser texteki jineke indiyan a ciwan raketibû. Ew du roj bû dixebeitî û hewl dîda ku zaro-

keki bîwelidîne. Hemû jinê wi wari alikariya wê dikirin. Mêran xwe hineki dûr dabûn, bê-deng dî nav tariyê da li ber diwar cigare dikışandin.

Wê kir qêrin dema Nick û ew herdu indiyân hatin hundurê barakê li dû bavê wi û apê George. Jinik li ser texta jêrin, dibin lhêfeke mezin da dirêjkiri bû. Li ser kêlekê raketibû. Li ser texta jorin méré wê raketibû. Wi, sê roj berê bîvir li piyê xwe xistibû, bîrindar bû. Qelûn dîkîşand. Li hundur bîhneke geleki ne-xwes hebû.

Bavê Nick ji wan ra got ku avê daynîn ser agir, û dî wê navberê da bî Nick ra qise dikir.

— Jî metê ra wê zarokek çêbe, wi got.

— Ez dizanîm, got Nick.

— Tu qenc pê nizani, bavê wi got. Ez nuha ji te ra bibêjm tu bîbihise. Jimik nuha dî wê rewşê da ye ku jêra dibêjm sanciyên welîdan-dinê. Hemû reh-tamarêñ bedena wê dikin ku zarok bête dinê. Ev tişta dîqewime dema ew dike qêrin.

— Ez fehm dikim, got Nick.

Hema wê gavê qêjinek ji jînikê çû.

— Oy, bavo ma tu nikani tişteki bîdi wê ku êdi ew wîsa neqire? Nick pîrsi.

— Na. Tu dermaneki tevízandinê bî min ra tune, bavê got. Lî ew ku dîqire tu maneyeke wê tune. Ez wê qêrinê nabîhisim, min guh lê nine, ji ber ku maneyeke wê tune.

Mîrikê li ser texta jorin xwe berbî diwar zi-virand.

Jînika li mutfaxê bî işaretekî ji doktor ra da xuyan ku av germ bûye. Bavê Nick derket çû mutfaxê, hema-hema qasi nivê ava beroşê berda hundurê teşte. Jî nav desmaleke pêçayı çend tiş derxist avete nav wê ava ku ji ber mabû.

— Ew dê bîkele, wi got û dest pê kir di teşte da bî wê ava germ û sabûna ku wi bî xwe ra ji kampê anibû destê xwe şûst. Nick lê dînihêri çawa desten bavê wi bî sabûnê hevdu mîzdîdan. Dema bavê wi bî itina û xweşik desten xwe dişûst, pêra ji qise dikir.

— Tu dizani, Nick, esasen zarok çaxa dibin, dîvê serê wan li pêş derkevin, lî carna wîsa nabe. Dema ne dirêjkiri bin, hingê gelek tevhîvi û çetinahi peyda dibin. Dibe ku li dawiyê ez bêçare bîminim û wê emeliyat ji bikim. Ka em bînihêrin, lehzeki şûnda wê diyar be.

Dema destşûştin qediya çû hundur û dest pê kir.

— Dixwazi lhêfê bîkşine jêr George? Wîsa be ku ez bîkaribim serbest bîlvîm.

Piştî ku wi dest bî emeliyatê kîribû, Apê George û sê indiyân bî hevra hûş bî jînikê girtibûn. Wê milê mam George gez kîr û mam George got: — İndiyana şeytan! û ew xortê indiyân yê ku ji apê George ra kelek ajotibû pê dikenîya. Nick li ber destê bavê jêra teşt girtibû. Heta ev iş kuta bû gelek zeman derbas bû.

Bavê wi zarok hîlda û hejand ji bo ku bîhna xwe bigre, û ew da destê diya wi.

— Bînihêre, ew kur e, Nick, bavê wi got. Kêfa te bî vi pêşeyi (iş, meslek) ra tê Nick?

— Erê, baş e, Nick got. Nick wîsa li dûr dînihêri ji bo ku nebîne bavê wi çi dike.

— Aha ev ji wîsa. Nuha xelas, bavê got û tiştek dani hundurê teşte.

Nick lê dînihêri.

— Ü nuha, bavê wi got, tenê çend kîl mane bîn dirûtin. Tu dikari bînihêri yan ji nenihêri Nick, tu bî kêfa xwe yi, çawa dixwazi wîsa bîke. Ezê nuha disa bîdirûm wan qelşen ku min vekiribû.

Nick nedînihêri. Vê dawiyê êdi meraqa wi bîhna bû.

Bavê wi karê xwe kuta kîr û pişta xwe rast kîr. Mam George û her sê indiyân rabûn ser piyan. Nick teşt bir dani mutfaxê.

Mam George li milê xwe dînihêri. Hingê lawkê indiyân ew bûyer ani bira xwe û pê kenîya.

— Ez dê hîneki ava oksijenê têdim, doktor got.

Wi xwe di ser jînika indiyân da xûz kîr. Jînik wîsa westiyayi bêdeng û bîlivin dirêjkiri bû û çavên wê ji xwe va çûbûn. Reng lê çûbû. Zarok çawa bû, çi bû, qet haj pê nebû.

— Ezê sîbê zû disa bêm, doktor got û rabû ser xwe. Hemşireyeke St. Ignaceye dîvê nêziki nivê şevê li vir be, û hertiştê ku ji me ra pê-wist e, pêra heye.

Wi xwe ji bo gale-galê wîsa amade his dikir, te digot qey fotbolistik e ku piştî maçê li oda kînguhastimê, bi hevalan ra dipeyive.

— Ev tişteki welê bû ku tam ji bo rojnameya doktoran e, George, wi got. Deranîna zarokê ji qelşâ Keyseran (derxistina zarokê ji zik; berê jinê şah û keyseran bî vi awayi zarok di-

welîdandin. W.) ku bî kereke kevan hat qelaştin û paşê bî deziyekî neh fot dirêj hat dirûtin.

Apê George pişta xwe spartibû diwar û li

mulê xwe dînihêri.

— Bî rasti tu miroveki mezin i, wi got.

— Divê em hineki ji serbilindi û dilxweşîya bavê binihêrin. Ew piri caran bî çirokên weha biçûk diêşin, doktor got. Piyê xwe dani ser kenarê texta jêrin û lampe dî dest da hilpaski jorê bû, li nav nîvinan nîhêri. İndiyan li ser kîlekê, rûyê wi ber bî diwar dirêjkiri bû. Stuyê wi hatibû bîrrin, ji guheki, dî qırıkê ra, hetani guhê dîn. Jî ber textê razanê xwina laşê wi kîşiyabû û dî kortikênen ser laşê wi da civiyabû, bûbû gol. Stuyê wi ketübû ser mulê çepê. Gûzan devvekiri dî nav betaniyan da bû.

— George, Nick derxe derva, doktor got.

Çi hewce dikir? Nick dî deriyê mutfaxê da sekînibû û bî hêsanî li qenapa İndiyanê miri temaşê dikir, dema bavê wi bî desteki lampe girtibû û bî destê dîn ji serê İndiyan hejand.

Gava ew ketin ser riya esasi û ber bî golê dîcûm, édi dînya ronkayî dibû.

— Bî rasti ez geleki xemgin im, ku min te bî xwe ra hûlda ani nav vê belayê, Nick, bavê got nuha ew sersemi û westa piştî emeliyatê derbas bû. Xwezi tu qe nehatayı û te ev çiroka tîrsox nedita.

— Her tîm weha dijwar e ji bo jinan, dema zarakan dîwelidinîn? Nick pîrsi.

— Na, ev tişteki geleki nediti û nebinayi bû.

— Wi çîma xwe kuşt, bavo?

— Ez nizanum. Qey nîkaribûye tehamul bîke.

— Ma gelek caran mîr xwe dikujin bavo?

— Ne gelek caran.

— Lî jîn?

— Ew hema-hema qet xwe nakujin?

— Qet?

— Pîr kêm caran dîqewime.

— Bavo?

— Erê.

— Apê George kuda çû?

— Wê qaseki şunda bê.

— Mirin dijwar e bavo?

— Na, ez dibêjîm qey geleki hêsan e, Nick. Girêdayî rewşê ye.

Dî kelekê da rûniştin, Nick li pêşiyê û bavê wi li ber bêrokan rûnişt. Roj bî ser çiyan ra hilhat. Kalinoseki xwe hilavêt, helqek çêkrî dî avê da. Nick destê xwe berda nav avê. Av hênik bû dî wê surra sibê da.

Dema ew, serê vê sibê zû, li ser wê golê li aliyê pêşiyê ê kelekê rûniştibû û bavê wi jî dîajot, ew wîsa ji xwe emin bû, mina ku wê qet nemre.

## gotinêن pêşîyan

Berevkar : SALIH

\* Revandi rûnê helandi

\* Mala mîra kaniya zêra.

\* Sed sali li dînê bi, şeveki mîvanê qebrê bi

\* Kurmanc têr e, xew jê ra xêr e.

\* Ereb û rez filleh û pez..

\* Heger ev ne ben e ev çî fen e.

\* Latîk ber Allah-û ekber

\* A dînê a dînê çavê gur li bîzinê.

\* Teyrê teyr warê bav û kalan nasdike.

\* Nanê mîra li mîra bî deyn e.

\* Ma ka ka te ye, kadin ji ne ya te ye.

\* Mamê mama aqilê fehma.

\* È zane zane, è nezan e baqê niskan e.

\* Yê dizane dizane, yê nîzane baqê niskan e.

\* Mal têr e, kevani şêr e.


\* Lî kaşan ranezê ku xewnê xerab nebini.

\* Qulê diwaran bî guh in.

\* Jî delava ket şîrava.

\* Çiyayênil bîlind bê mij nabîn, newâlîn kûr bê av nabîn.

# *helbest*



## **gewrê**

Çaxa hember zıvistanê  
 Şer dîke hêşimayı  
 Kulilkên berfê dîbişkîvin  
 Zorê dîdîn erdê  
 Pêşîya sîr û sermê  
 Ü dema dîkele xwin  
 Nav rehêن te

Bîke bir  
 Min jî bir neke

Danê sîbê  
 Wexta zerayı dîkeve ser belekiya çiyan  
 Bayê şefeqê hîşyar dîke  
 Tebiet û mexlûqetê  
 Ü laçka te ya nexdekiri  
 Davêje jî serê te  
 Porê hewrişim derdixine...

Bîke bir  
 Min jî bir neke

Zemanê  
 Nav xas-baxçê azadiyê  
 Rûgeş dîgeri tev neviyêن xwe  
 Xwezi tu ji hebûyayi nebêje  
 Ü bila şîل nebîn bijangêن xweşik

Lê bîke bir,  
 Min jî bir neke.

VAZGAL

21. 10. 1986

# KINCÊN SPORÊ

## YÊN SÊ-RENG

3

VAZGAL

OMER	: Derheqa van tiştan belavokek ji zindanan derxistine derva, mîn xwend.	DAYIK	: Xeribê çi dikşine ji destê lawê xwe yê dinik dikşine. (Paşê Omer dinhêre û bi dengêk bûlind) Tu çîma li ber pencerê sekîniyi? Were zu qqima xwe bixwe!
NERİMÂN	: Erê, erê, mîn ji dit. Anîne fabrika me belav kîrîne. (Aliyê Seyrê dizvirc) Hindîk mabû minê bir bîkîra. Lawê te yê Şayaqê işev nayê mal, li benda wi nesekînim. De êdi ez dîçim, dereng e. <i>(Seyrê dî bin tesira gotinan da tê bêji qey ji xew rabûye, nişkêva)</i>		(Omer tê ser sîfrê, lê kiuşê hersê ji medê wana êdi naçê ku bixwin. Lexzck paşê deriyê wana ji scxt-mehkem té kutan. Zar ranabin, Seyrê radîbe diçe ber deri ku veke, li ser dengê derva discikine.)
DAYIK	: Neçe li vîra bîmine, Xudê çi dabe emê tev bixwin.	D.DERVA	: Deri vekin Kurde hov, zû bîkîn nebe emê deriyê we bîşkênim! (Seyrê wck gêjbûyi hin radiweste, pencere ji tê kutan û cam dişkê, lûla twingek dirêji nav odê dîbe, Seyrê hazuka deri vedike. Bi dijûn, bi qêrin dîkevîne odê. Esker û polêzén resmi û sivil tiji malê dîbin. Twingên xwe dizvîrinin ser herdu yê rûniştî. Seyrê li ber deri huşk bûyc maye. Malê ser û bin dîkin, tu tişt nabinin. Polêzek sivil kincê sporê yê ku Omer li xwe dike dîbine, hildide destê xwe, bala xwe didê, diçê cem yekê din péra bêdeng qise-dike, paşê vedigere orta odê. — Rengê cilê Omer kesk û zer e, li pêşirê da bi herfîn mezîn DS hatîye nûvisandin—)
NERİMÂN	: Sîpas Seyrê, li mal hînek karê mîn ji heye. (Diçe ber deri, deri vedike û bangê kurê xwe dike) Elo! kuro li ku yi? Were!		: Ev yê kê ye?
DAYIK	: Keçê Eyşê, de xwarînê hazır bîke em birçi bûn. Omer çû kê derê?		: Cilê mîn ê sporê ye.
EYŞE	: Çû dest û piyê xwe bîşo, wê were. <i>(Eyşê, pineki tînc radixe erdê, 3 kevçî û quşxanekî datine ortê. Omer ji tê, rûdinêñ dest bi xwarînê dîkin. Li derva deng têñ û hêdi hêdi ji zêde dîbe. Omer radîbe, perdê pencerê piçek dîde aliki û derva mîze dîke. Kulma xwe ya rastê li destê çepê a ve kiri dîce û bi hêrs qisêdike.)</i>	POLÊZ	: Kurê kerê, mina vi cilê sporê dîbe?
OMER	: Weka her caran disa ewili çûne mala xatiya Neriman.	OMER	: (Radîbe ser piyan) Ev cilê Ku-

POLÊZ	<p>: lüba Diyarbekir ya kevn e, hûn ji dibinin çawa periti ye. Diya min pine kuriye. Tu çima didi xebera?</p> <p>: Huş be! Kurdê pis û qominist. Ev reng ê ala we Kurdan e, usa ne tu ji ji wana yi!</p>	DAYÎK	<p>: Zarokê min berdin, ma keç û kurê we ji hene. (<i>Bêhna xwe distine, disa xwe gij dike bi aliyê zaroyen xwe va biç, lê esker disa nahêlin</i>) Ev dewran wê ji we ra ji nemine...</p>
OMER	<p>: Ez ji berê va topê dîlizim, serokê taxima me evên kevn li me xortan belav kırıbû. Nuha ji ez li malê li xwe dikim.</p>	POLÊZ	<p>: Hele li vana binhêrin.. Bî rasti ji evana bî temami Kurtçi ne. (<i>Hin bî ser Eyşê va diqire</i>) Dengê xwe bibire qaltax! Binhêre emê te a diya te ji bibin, paşê aqlê we wê baş bê serê we!</p>
POLÊZ	<p>: Tu ewana ji kumê min ra bibêje. (<i>Dest davêje pêsira Omer digrc û dihejine.</i>) Emê bî te ra li merkezê xeber bîdîn. (<i>Aliyê eskeran didefine, Seyrê bî lez bi aliyê wan va diçe.</i>)</p>	OMER	<p>(<i>Omer hildidin diçin, lê wextê çüyinê ji , derdoran bela-belayi dîkin</i>). : Hûn meraqê nekin, yadê ezê çend rojan paşê disa derkevîm werim. Tu caran qesr û qonax bî zorê ava nebûne.</p>
DAYÎK	<p>: Tu çi diki polêz efendi? Ew hin zarok e, tu tiştan tê naghije.</p>	DAYÎK	<p>: Xudê mîala we li ser we hemuşka da bine xwarê. (<i>Lî ber deri li çoka dikevîc, wê çaxê miqamckî dilşewat a zulma roma reş diyar dike ku wê werek lêxistin. Nericman, tevi Elo dikevinc oda wana, Seyrê ji erdê radike, diçinc ba Eyşê ewê ji hildidin, destê hev digrin û bî aliyê temaşevanan va diçin; hevalên ku dilizin ji kit bi kit dikevin schnê û destê hev digrin. Miqam digihurc û marşek Kurdi tê lêxistin, deng ji hêdi hêdi tê birin. Piştre bî tevayı diqirin:</i>)</p>
ZABIT	<p>: Tu çi fehm diki keftor. Evana dixwazin welatê me parce bikin, ji rûyê vana huzûra me nemaye. (<i>Paşê destê xwe ji Seyrê ra dihejine</i>) Hûn nikarin evana baş terbiye bikin, qet xema nekişine emê kurê te ji rind terbiye bikin, bî aqlê te here dizi bike baş e?</p>	ZABIT	<p>: Terbiya çi qomitan beg? Omer mekteba lisê qedand, kar tune ye, diçe hol dilize, bî aqlê te here dizi bike baş e?</p>
DAYÎK	<p>: Pira ne tu tişt, dengê xwe bîbirê! (<i>Bî destê xwe "dûr hcre" dibêje û dihejine, eskerek tê Seyrê bî zorê dîbe koşa odê</i>)</p>	DAYÎK	<p>: Ezé çima dengê xwe bîbirim? Gunehek lawê min nine, hûn çima ewi dîbin? (<i>Esker hin cwe dixe koşa odê, cw ji dengê xwe bilind dike</i>) Lawê min berdin...</p>
ZABIT	<p>(<i>Polêzch diçe aliyê Eyşê, destê xwe dirêji rûyê Eyşê dike</i>)</p>	DAYÎK	<p>Ev êşkence, Ev zordesti, Ev teror, Pirani anine Serê xelkê Kurd Zindanên wana Têra me nekir Roj me kuştin Bî saxi şewitandin! Lê nikarin me bîqedinîn! Têkoşina me rawestinîn! Serê me li jor, Nav kar û xebatê ne em! Bo azadiya Kurdistan Bî mérxasi, bî yekiti Dî nav şerê da ne em!</p>
DAYÎK	<p>: Ezé çima dengê xwe bîbirim? Gunehek lawê min nine, hûn çima ewi dîbin? (<i>Esker hin cwe dixe koşa odê, cw ji dengê xwe bilind dike</i>) Lawê min berdin...</p>	EYŞÊ	<p>: Tu çi diki, destê xwe bikşine! Dî we da tu wujdan û namûs tûne ye? Êdi besê, bî çi heqqi hûn birayê min dîbin?</p>
EYŞÊ	<p>(<i>Bî sutali dikene</i>) Mirov li aşan dawa heq dike. Lî vira heq ji, zagon ji, dewlet ji em in.</p>	POLÊZ	<p>: Tu súcê birayê min nine, wi berdin! (<i>Radibe ser piyan û bî aliyê Omer va diçe. Esker çend kulm ji li wê dixin</i>)</p>
POLÊZ		EYŞÊ	
EYŞÊ			DAWÎ



## PİDIX Ü PİRA MIROVXUR

Berevkar: SİPAN

**H**ebû tunebû dî demeki da pirek hebû lêpir xizan bû. Jî zar û zêçan ew bû, kureki wê bû. Kesi wê tune bû. Pirê, navê xwe Pîdix lêkîribû. Dem û dewran dibore û Pîdix mezin dîbe. Lê Pîdix, ne Pîdix e, ew melkemotkê kulê ye. Rojeki keçen Gund dîcîvin ku herin gêziyan, pirê ji dîke ku bî wan ra here, lê dizane ku êdi nikare li çiya û baniya, kaş û ber-kaşan bigere. Lavayî li keçikan dîke û dîbê: "Kesi min tune, ez im Pîdix e, wê çawa be? Hûn ewi bî xwe ra bîbin, bîla ew ji hînek gêzi ji me ra biçine, bîne." Keçik dizanın ku Pîdix netebiti ye, wê dî rê da bîbe cila şîl bîkeve stuyê wan. Êdi bo xatîrê pirê tu rêki nabinin dîbêjin, "baş e pirikê here, nanê wi dagre, kapeki bîdê û bîla were". Pirê şâ dîbe, dîbê, "lawo, Pîdix berê hêviya Xwedê paşê ji hêviya we dîmine. Hûn tev herin û tev ji werin."

Pirê dîçe ji Pîdix ra mîrtoxe çêdike, tevi şeşek nan dadigre dîde pişta Pîdix, dîbê, "kurê min, de here ji dayika xwe ra gêziyên rînd û dirêj bine." Pîdix dîçe dîgihije keçikan, tev dîkevin rê û dîçin dîghêن cihê gêziyan, navça çiya. Her yek bo xwe rahiştîye gêziya dîçine, lê Pîdix ji xwe ra rûniştîye. Keçik dîbê, "Pîdix de rabe tu ji bo xwe gêziya berevke." Pîdix dîbê, "ez dest navêm gêziya. Dayika min ez hêviya

we hiştîme, hûnê ji bo min ji gêziya bîçinim." Keçik dizanın ku Pîdix gêziya naçine, êdi ji bo wi ji gêziya berev dîkin, kar û barê rîketinê dîkin, piştiyê xwe girêdîdim. Piştiyê Pîdix ji çêdîkin û dîbêن," de rabe pişte, emê herin, riya me dûr e." Pîdix dîbê, "ez gêziya nadîm pişta xwe, hûnê barê min ji hildün. Dayika min ez hêviya we hiştîme." Keçik mîzedîkin, Pîdix bar nabe. Êdi piştiyê wi ji, li hev pardîkin û tevi Pîdix bîrê dîkevin.

Hîneki dîmeşin, birçi dîbin, piştiyê xwe datinîn û nanê xwe dîxwin. Lê Pîdix, qet derê hevana xwe venake. Ew ji tevi keçikan dîxwe û cardîn li riya xwe berdewam dîkin. Qederekî dîçin Pîdix xwe davê erdê, dîbê, "ez westiyame, nikarım bî rîda herim." Keçik ber dîgerim, lavayî dîkin, Pîdix ranabe. Bala xwe dîdinê tu rê nine, yek ji keçikan, Pîdix dîde ser stuyê xwe, li rê berdewam dîkin. Hîneki dîçin, keçik bala xwe dîdê ku hêdi hêdi stuyê wê germ dîbe, bang


dîke hevalêن xwe dîbê, "bîsekînin, kaçıma stuyê min germ bû." Hevalêن wê dîsekînin, mîzedîkin wa Pîdix bî serda mîztiye. Keçik êdi Pîdix peyadîke, dîmeşin têن ber çemeki, keçik dîkeve avê û xwe dişo, Pîdix ji şapîkê xwe derdixe davê ber tavê ji bo zuwabe; nanê xwe

derdixe û dest bî xwarinê dîke. Lê wan kaçıkana ji, hemû birçibûne, dîkin û na-kîn Pîdix nan nade wana. Pîdix zikê xwe têr dîke lê êdi li wan dîbe êvar, ji rûyê Pîdix da derengi dîkevin. Difikîrin çawa bikin, bala xwe dîdinê ku dûki zi-rav ji dûrva ji pixêrika maleki dertê. Ke-çik, bî Pîdix va şêwra xwe dîkin, yek dîbê, "emê işev herin li vê malê bibin mîvan û sibê zû emê hern mala xwe." Bî vê fîkrê, dîçin dîghêن wê malê û li deri dîxin, pirek deri vedike, dîbê, "hûn çi dîxwazîn?" Ewana dîbêjîn, "dayika pir, tu mîvana xwedi diki, an naki?" Pir dîbê, "mîvan ser seran û ser çavan. Ka fermo werin hundir." Tu nebê ew pira ji, pira mirovxur e! Pîrsa keçikan dîke, "hûn tine, birçine?" keçik dîbê, "em ne tine ne ji birçine, em bê xew in, emê rakevin, nîvinêñ me bîne." Dema dîbêñ nîvina bîne, pir, cihê mîvanan û yên zarokêñ xwe tev tine radîxe. Şeş mîvan bûne û şeş ji zarokêñ pi-re bûne.

Pirê cihê zarokêñ xwe kîvş dîke, pişt dîde wana, dîce dîkeve hundirê tendûrê û diranê xwe tûj dîke. Keçik ketinê xewê lê Pîdix hin raneketiye, dizane ku pirê diqlqile, wê tişteki bî serê wan da bîne. Radibe hevalê xwe hişyar dîke, dîbê "rabin, emê cihê xwe û cihê zarokêñ pirê bî hevdu biguhurinin." Keçik dîkevin nav nîvinêñ zarokêñ pirê û zarokan ji dîkin nav nîvinêñ xwe. Pîdix dit ku pir hat û wê zarokan bîxwe, dest bî gîrinê dîke û dîbê: "Lê, dayika min li vir bûya niha bo min mirtoxe ser çirê çêkiribû." Pir dîbê, "megri, ezê bo te mirtoxe çêbikim." Bi lez û bez dîce mirtoxe tine dîde ber Pîdix. Pîdix mir-toxe dîxwe. Lê Pîdix dizane ku rewş ne baş e, cardin dîgri. Pirê dîbê, "disa çi-bû?" Pîdix dîbê, "dayika min herşev dîkete kunê diwara û bo min çivik dia-nin, min ji dîxwar." Pir dîce çivikeki

dîgre tine, Pîdix wê ji dîxwe lê armanca Pîdix ew e ku sibe bê, pir tişteki neyne serê wan. Hînek dîsekîne, disa dest bî gîrinê dîke. Pir dîbê, "lawo te nehiş ez işev xew bikim, tu çi dîxwazi Pîdix?"

Dema wîsa dîbêje Pîdix, axinek kûr dîk-şine, dîbê, "dayika min her tim nêziki destê sibê ji min ra elokek (culix) sor-dîkir, dîda ser savar ji min ra dîani û min dîxwar." Pir dîce dîkeve pûnika mi-rişkêñ xwe, elokeki tine serjê dîke, sor dîke, dîde ser savar û tine ber Pîdix. Pi-dix wi ji dîxwe. Êdi Pîdix xwe li xew davêje, pir dor bî dor zarokêñ xwe dîxwe, lê nîzane ku zarokêñ wê ne. Pîdix bî zanayi çavêñ xwe mîzdide dîbê, "da-ka pir, kezeb û gurçikêñ min ji tina şe-witîn, ka şelbîkek av bîde min." Pirê ra-dîbe cêr hîldîde, dîce ji Pîdix ra avê bi-ne. Pîdix, bangi hevalêñ xwe dîke, dîbê, "zû rabîn em bîrevin ji destê pirê xîlas bin." Radîbin, Pîdix cêreki, neynîkeki û şeki dîgre, berê xwe dîdin gundê xwe û dîçin. Bîla ew herin, pirê avê tine bala xwe dîdê ku kesek li mal tune. Hingê fam dîke ku wê zarokêñ xwe xwarine! Pîdix û hevalêñ wi dî mal da ninin! Agîr dîgre dîl/û canê pirê. Cardin dîde pey wan. Pîdix li paş xwe mîze dîke ku pi-re nêzikayi bî wan kîr, şe davêje pêşiyâ pirê. Wîsa dîbe ku pêş pirê hemû dîbe dehl û devi. Heta ku pirê ji wan astengiyan xîlas dîbe ewana geleki rê dîçin. Pi-re cardin nêzikayi bî wan dîke, Pîdix vê carê neynîke davêje pêşiyê, riya pirê hemû dîbe cemed. Dema pirê ling davê-je dişemîte, nikare here, dîkeve û radibe ji wê derê derbaz dîbe û li pey Pîdix dîreve. Disa nêzikayi bî wana dîke. Pîdix vê carê cêrê avê rodîke pêşiyâ pirê. Her der li pêş çavêñ pirê dîbe behr û derya û pir dîkeve nava wê. Pir dîxenîqe û Pîdix bî hevalêñ xwe va ji xîlas dîbin û dîçin bî mirazê xwe şadîbin...



**BIHA: 10:- kr.**